welat

*Rûpelek ji dîroka Kurdistanê:*

## Serhildana Agirî



*Rûpel 12*

Sal:1 Hejmar:29 6-12 Ilon 1992 5000TL (KDVD) **Rojnameya Hefteyî**

# Li ser doza Kurdistanê siya xiyanetê

*Roja 2'yê îlonê, Artêşa Tirk bi balefiran gundên Kurdistana Bakur dan ber bombeyan û bi tank û panzerên xwe ve derbasî Kurdistana Başûr bû. Serdana Berzanî û Telabanî û ketina Artêşa Tirk a nav Kurdistana Başûr, dîsa li hev rast hatin.*

*Berzanî û Telabanî bi navê "têkiliyên dîplomatîk", ji bo rêlêgirtina têkoşîna PKK'ê, bi serokên dewleta Tirk re planan çêdikin. Dewleta Tirk dixwaze rêxistinên feodal bixapîne û berê wan bide PKK'ê. Pêşengiya van rêxistinên feodal jî PDK û YNK dikin.*

*Rûpel 8*

## Li Bakur Tirkiye li Başûr Cepha 'Kurdistanî'

*Îro çawa Tirkiye dixwaze bi qirkirinan, rê li ber têkoşîna Kurdistana Bakur bigire, rêxistinên Eniya Kurdistanî jî, bi êrîşên xwe yên li hember şoreşgeran, ji vê armanca Tirkiyê re, xizmet dikin. Welatparêzên Kurdistana Başûr ji aliyê pêşmergeyên Eniya Kurdistanî ve tên kuştin*

*Rûpel 9*



*Her zarokekî Kurd gerîlayekî pêşerojê ye. Bi wan jî mabe, wê rê li xiyanetê bê girtin.* Wêne: Hönkel



**Kûrdên Êzîdî**

Amed û Zînê

*Rûpel 6*



**Ji aliyekî din ve Amerîka**

Gavan Koçer

*Rûpel 4*



**Faşîzmeke eşkere: 12 Îlon**

Mîrhem Egît

*Rûpel 14*

# REWŞ



Abdullah Keskin

## Kurdên Cûdî û Kurdên Enqerê

Kurdên Cûdî û Kurdên Enqerê kî ne? Çima ji hevûdin cihê ne? ferqa wan çi ye?

Tiştekî veşartî nema ye. Her tişt xuya ye. Îro perdeya li ser rûyê komik û "serokati" yên Kurdan radibe. Lê mixabin ji bin perdê tişten xerîb derdikevin. Hebûna hinek "Serokati" yên Kurdan bi xiyanetê ve girêdayî ye. Ew serokê bi debdebe jî aktorên vê listikê ne; lîstika xiyanetê.

Li dîroka Kurd û Kurdistanê binêrin, Kurdan derbê mezin ji hundir xwarine. Xiyaneta herî mezin, ji me, li me ketiye. Divê em ji diroka xwe îbretê bistînin.

### KURDÊN CÛDÎ

Kurdên Cûdî ji her deverên Kurdistanê ne. Başûr, Bakur, Rojava, Rojhilat, Ewrûpa, Êrîwan ferq tûne ye. Hemû ji bo dozekê, di şer de ne: Doza Kurdistan. Li Bakur in, li Başûr in, li Ewrûpa ne, an jî li Nexçîwan in...Hemû yek in, doza wan yek e. Ew jî, azadî û serxwebûna Kurdistanê ye. Li kuderê bin, li dijî zilmê di şer de ne. Li Ewrûpa, bi kar û xebatên xwe, li dijî imperyalîzmê têkoşînê didin. Li Lubnanê, li Filistînê bi Filistîniyan re, li dijî siyonîzma Îsraîl şer dikin.

Kurdên Cûdî li kuderê bin, li kîjan welatî bin, li ser çi erdî bijîn, bindestiyê qebûl nakin, evîndarê azadî û serxwebûnê ne, ji bo wan di şer de ne.

Tirsa dilê mêtinger û dagîrkeran e Kurdên Cûdî. Li Dersimê ala Seyîd Riza hildigirin, bilind dikin. Demeke din wê li Mehabadê bin. Têkoşîna Qadi Muhamed bidomînin. Serhildana Cûdî li her deverên welêt belav dibe.

Çiyayê Cûdî îro bombe dibe.

### KURDÊN ENQERÊ

Herkes Kurdên Enqerê nas dike. Her dem nasnama xwe diguherin. Doh li Tehranê bûn, li Şamê bûn, bi pasdar û ajanê SAWAME re rûdiniştin. Pêr pişta xwe didan Şah Riza Pehlewî, muhatabê wan jî, ajanê SAVAK bûn. Îro li Enqerê "Îstîxbarat" didin MÎT'ê. Li Washington' in, li Wiyana û Londenê ne. rengê pasaporta wan sor e, kesk e, şîn e... Mohra Tc li ser e.

Berî çend mehan li Baxdayê bûn. Îro ambargoya li ser Îraqê rabe û Seddam gazî wan bike, wê dîsa riya Bexdayê bigirin.

Gelo riya Tehran û Bexdayê di nav Helepçe re derbas dibe an na?

### "ÎSTÎXBARATÊN" TELABANÎ

Telabanî mirovekî cambaz e. Lê herdem li ser benê xelkê dimeşe û dilîze. Ajanê SAWAME li Wiyana wek dîplomatan bi Ebdurahman Qasimlo re rûniştin û bi qelleşî kuştin. Telabanî jî bi cilên dîplomatan wezîfa ajana pêk tîne. Bi endamên MÎT'ê re rûdinê û li ser "têkiliyên PKK û Seddam" îstîxbaratan dide Tirkiyê. Gelo Telabanî çi malûmatan difroşe Tirkiyê?

Wê rojê, rojnameya Sabah di heşt stûnan de kiribû manşet. Li gorî xwe, têkiliyên "PKK'ê û Îraqê" îspat dikirin. Xeber ji serî heta bi dawî asparagas bû.

Piştî vê xeberê nivîskarê rojnameya Cumhuriyetê Cüneyt Arcayürek, ji Wezîrê Karên Derve Hikmet Çetin dipirse. Çi bêje baş e? Xebera wî, ji tiştekî tune ye. ji bo îstîxberata ku, Telabanî dide MÎT'ê jî wiha dibêje:

"Tu delîl nîn in. Îddîayên Telabanî ku ji bo têkiliyên PKK û Îraqê jî dibêje, ne ciddî ne."

Wezîrê Tirkiye wilo dibêje û tu îtîbarê nade îstîxbaratên Telabanî.

### MESUT BERZANÎ

Mesud Berzanî "serokatî" ji bavê xwe girt. Îro reyisitiya eşîra Berzaniyan dike. Li alîkî din, di bin perrê kolonyalîstan de demokrasiyê difiroşe. Behsa diktatoriyê dike.

Li paytaxta Tirkiyê, li Enqerê, li ser têkiliyên PKK'ê û Îraqê disekine. Ma ji mirov napirsin "Çi îşê te li wir heye?" "Tawsiya me, li Mesud ew e ku aqîbeta bavê xwe, Mele Mistefa bîne bîra xwe. Ew jî, li Washington an li Enqerê nemire.

Eniya Kurdistanî, çi ye û bi kêrî çi tê? Ewên ku nikarin welatê xwe biparêzin, li Erbîlê Kurdên ku qetlîama Şirnexê protesto dikin, dikujin. Tu kes nikare bi navê Kurdistanê dijminatiya gelê Kurd bike. Tu kes êdî nikare Kurdên Başûr-Bakur berde hev. Pêşmerge û gerîla çekan li hev û du nakşînin. Divê Mesud vê yekê zanibe.

Piştî xiyaneta Rayber, serokê serhildana Dêrsimê Seyid Riza dibêje: "Navê zarokên xwe Rayber daneynin." Eger îro bijiyana wê wiha bigota: "Navê zarokên xwe, Mesud daneynin."

## FERHENGOK

**Bertil:** Ruşwet
**Cil:** Kinc (elbise)
**Cîl:** Nifş, nesîl (kuşak)
**Dahat:** (gelir)
**Dawşî:** Döküntü
**Dilbijî:** Teşwîk, handan
**Gêrû:** Merkez (odak)
**Gilî:** (şikayet)
**Gilîname:** (dilekçe, şikayet dilekçesi)
**Hota:** Winda (kayıp)
**Hotakirin:** Windakirin
**Jar:** Reben
**Jarî:** Rebenî
**Jehrî:** (zehir)
**Jinbav:** (Üvey anne)
**Mêzîn:** Terezi (tartı)
**Mirovhez:** Humanîst (insancıl, insansever)
**Mirovkuj:** Qatil (katil)
**Pelikandin:** (endişelendirmek)
**Pelikîn:** (endişelenmek)
**Pingar:** Asteng, kosp (engel)
**Rêzanistî:** (bilimsellik)
**Serpêhatî:** Serbuhorik, macera, bûyer
**Şalûz:** (dalkavuk)
**Serhişk:** Înatkar
**Serhişkî:** Înat
**Wêbê:** Pêşeroj, hatin (gelecek, atî)
**Wezinandin:** Nirxandin, teqlandin (tartma, değerlendirme)
**Xwazgîn:** Görücü

## NAMEYÊN XWENDEVANAN

### Gelê Kurd bibin yek

Roja 18'ê Tebaxê beriya saet yekê ez li Stenbolê li qehwexaneyek rûniştîbûm. Saet yekê de diviya ez rabûma, lewre dema destpêkirina karê min bû. Ez li ber rabûnê bûm, televîzyon dest bi dana nûçeyan kir. Gelê ku li qehwê rûniştîbûn tevî yên derve berê xwe li televîzyonê zivirandin û lê temaşe kirin. Lê ez şaş mam. Lewre ez gelek caran li vê qehwê rûdiniştim, min tu tiştek wiha nedidît. Tu mirov meraqa nûçeyan nedikirin û nedibeziyan ber bi televîzyonê ve. Min fêm kir ku nûçeyên giring hene û min li piya guhdariya televîzyonê kir. Di nûçeya pêşîn de spîker behsa cerda (baskına) ku gerîla biribûn ser Şirnexê kir!

Bi vê bûyerê re bû piste pista gelê qehwê û bi hev re peyivîn. Mehd û mirûzê xwe tal û tirş kirin û di rûyên wan de xwîn sor bû.

Ji hev re digotin: "Lawo de bila derdorê gerîla bigirin û wan biqelînin. Ma qey şêr in çi ne? Nebû bila bombayek jehrê bavêjin Şirnexê wê îşê wan biqede."

Ên ku wiha dipeyivîn Erebên Sêrtê bûn. Gelê me yê Sêrtê wan ereban baş nas dikin. Ku Erebên hundirê Sêrtê çi anîne serê gundiyên reben ên Kurd. Kurdan çi bi wan kiriye ku ew wiha difikirin.

Îro pirrê Erebên hundirê Sêrtê li ser pişta gundiyên Kurd, dewlemend bûne û niha jî li Stenbolê rûdinên, bazirganiyê dikin. Piştî spîkerê televîzyonê nûçeya derbarê gerîla qedand ez derketim der. Ez ketim rê ji xwe re dimeşiyam. Di rê de min dît ku texsiyek qije qija qorna wê ye.

Texsiya gewr bi sloganan (dirûşman) xemilandine û ala Tirkiyeyê bi ser wer kirine. Li ser kaxizek mezin wiha nivîsandibûn.

"Türkiye bir ol" anku gelê Tirk bibe yek. Êdî divê em hişê xwe bînin serê xwe ji ber nîjadperestiya gelê Tirk û Ereb. Kesê dibêjin dewleta Tirk ne dijmin e êdî bila serê xwe hildin, çawê xwe vekin, di korîtî û xewê de nemînin.

Gelê Kurd bibin yek!

Pêwist e em bibin yek, yek ta û yek rihek (giyan) em li ber dijmin hetanî rizgariya Kurd û Kurdistanê di ber xwe bidin.

Gelê Kurd êdî bes e, dest bidin hev û ji bo daza welat destê xwe bilind bikin.

*Elî Roj / Stenbol*

Ez bi, her hejmara Welat pirr kêfxweş û dilşa dibim. Bi saya we hînî zimanê xwe dibim û pêşve diçim. Di vî warî de xebata we ya welatparêzî pîroz dikim. Dil û canê min tim û tim bi we re ye.

Hestên min ên welatparêzî liviyan û ketin şiklê helbestekî. Eger hûn minasib bibinin, biweşînin. Bimînin di nav xêr û xweşiyê de.

### Emê bifilitin ji bin destan

Ax! ax!
Gulle sar dibin li ser singa wî...
Hê ne dîtiye xortaniya xwe, ciwaniya xwe.
Şerekî mezin li ber me.
Dijmin zalim e, bê rehm e.
Ji bo bedela azadî û serxwebûnê,
Emê çiya û zinaran şil bikin
Bi xwînê.
Bila dayik li ser eniya zarokan
Îşaretan xêz bikin,
Ji çavkaniyên xwe kîn bimijînin
Şûna şîrê.
Lorî loriyê wan
Bila bibe dengê tifing û berekan.
Êdî kes nikare me pê bigre,
Emê bifilitin ji bin destan.

***Mele Cimayê Babî / Bursa***

### Welat zimanê şoreşa me ye

Bi navê Yekîtiya xwendevanên welatparêz ên Kurdistanê, şaxê Yugoslavyayê, em pîrozbahiyên xwe pêşkêşî rojnemeya Welat dikin. Nêrînên her xwendevanê durust û welatparêz ên di welat de derdikevin me kêfxweş dikin. Zimanê welat zimanê gelê me û yê şoreşa me ye.

Ji ber vê yekê em ji dil û can pîroziya wê dikin û em spasdarê her karkerê redaksiyona welat in.

Me dixwest bi firehî li ser rewşa Yekîtiya xwendevanên Kurd ên li Yugoslavyayê bisekinin, lê belê derfeta me ji ber rewşa Yugoslavyayê tune ye.. Ji ber ku Yugoslavya perçe bûye û pirr tevlihev e.

Lê dîsa jî, heta ji me bê, emê di peş de we ji kar û xebatên xwe yên li ser riya azadî û serxwebûnê haydar bikin.

Bi bîr û baweriya şoreşa Kurdistanê û berpirsiyariya vê şoreşê em careke din rojnameya Welat pîroz dikin û serkeftina wê dixwazin, ji bo hemû Kurdên welatparêz û evîndarên welatê xwe û deşt çiya û zozanên Kurdistanê

***Yekîtiya Xwendevanên Welatparêz ên Kurdistanê, Şaxê Yugoslavya***

## Pîrozî

Berpirsiyarê Giştî yê rojnameya me, Abdullah Keskin, roja 5.9.1992 an, bi xebatkara Melsa, Selda Çiçek re zewicî.

Em ji bo heval Selda û Abdullah jiyaneke bextiyar û dilgeş dixwazin û wan pîroz dikin.

***Xebatkarên Welat***

# Pîrozbahiya PAK'ê

**Rexirawî Derve**

Şeva Yekîtiya Neteweyî û pîrozbahiya "1" saliya Partiya Azadiya Kurdistan (PAK) li Danmark, Kopenhagen hate pîrozkirin

28.8.1992 roja înê ahengî yekemîn salrojî damezrandinî Partî Azadî Kurdistan (PAK) li Danmark, gîra bi beşdarî nexîkey pênsed (500) niştimanperwer.

Yadî damezrandinî (PAK) bi coş û xroşî niştimanperwerî ye we derbas bû. Li sereta û destpêkirdinî şewde, Koma Serxwebûn (Koma muzîk) Layengiranî (PAK) li Kopenhagen bi sirûdî şehîd, deqeyek bo canî pakî şehîdanî regayî serxwebûn û azadî Kurdistan rawestan. Herwiha li ahengkada çend mêwanekî dengbêj, wek "Sefkan û Diyar" li Hunerkom, bi stranî şoreşgerî û folklorî beşdariyan kird. Herwiha "Nasır Rezazî bi çend stranekî gelerî şeweke ahengeke razandewe. Lem şeweda cigelewitarî siyasî (PAK) Nunerî (ERNK) jî witarî piştgirtin û pîrozbayî bo Partî Azadî Kurdistan pêşkêş kird. Herwiha musîga canî bi nav bang û dilsozî Kurd, mamosta "Îqbal Hacîbî" wek mêwanek li Ahengekada bejdar bû, piştgirî û amadeyî xwe yi bo (PAK) derbirî. Ev şeva bi yarmetî dilsoz û niştimanperweranî bakurî Kurdistan saz kirabû. Û, bi rûhekî netewî û yekîtî ahengeka Kotayî hat, bi siloganî "Bimre desttêkilaw kirdin. "Bijî yekîtî Neteweyî Gelê Kurdistan."

# Demirel ji bo çi hat Melazgirê?

**Gelê Melazgirê rû neda serokwezîrê dewleta Tirk û cejna wan a 26'ê Tebaxê pîroz nekirin.**

**Encî Egît**

Roja 24,25 û 26'ê Tebaxê esnafên Melazgirê dîsa dereben (kepenkên) xwe girtin, şoferên wê jî ereben xwe nexebitandin. Lê vê carê ne tenê ji bo Faruk Eren ji bo mirovên ku li Şirnexê hatin qirkirin jî, gelê Melazgirê dewlet protesto kir. Roja 26'ê Tebaxê jî, serokwezîrê Tirkiyê Demirel hate Melazgirê. Demirel ji bo pîrozkirina 26'ê Tebaxê hatibû, lê dît ku Melazgir ne Melazgira berê ye.

Demirel dît ku, gelê Melazgirê jî, wekî Şirnexê ye. Bi rastî jî, agirê ku Komara Tirk li Şirnexê barand çirûskê wê gihîşte Melazgirê û ewçend nav û dilê gelê Melazgirê jî şewitand. Ji ber vê yekê, gelê Melazgirê rû neda serokwezîrê Dewleta Tirk. Demirel dît ku li ku dibe bila bibe, gelê Kurd ji zilm û pesta dewletê re bêdeng namîne û li ber xwe dide. Dema ku Demirel hate Melazgirê herder girtî bû. Di wê roja ku Dewleta Tirk ji xwe re cejn îlan kiribû, li ser tu dikanî ala Tirkiyê tune bû. Ji xeynî leşkeran û reîsê belediyê tu kes neçû pêşiya Demirel. Bi kurtî roja 26'ê Tebaxê Demirel, leşkerên dewletê û çend heb Karmend (memûr) ji xwe re pîroz kirin. Îsal bi sê-çar leşker û Karmend ve be jî, Demirel 26'ê Tebaxê pîroz kir lê "gelo wê salekê din jî, karibin pîroz bikin?" Divê nevê mirov ji xwe dipirse.



*Süleyman Demirel*

# Patnos jî şiyar bû

**Têkoşîna neteweyî her diçe berfireh dibe. Bajar û navçeyên ku, razayîbûn her diçe şiyar dibin. Ji wan navçeyan yek jê Patnos e.**

Herêma Serhedê, roj bi roj bi ser xwe ve tê û jîn dibe. Êdî li hemû bajar û gundên Serhedê jî, gelê Kurd li doza neteweyî xwedî derdikeve, li hember zilma dewletê bêdeng namîne û li ber xwe dide. Navçeya Agirî, Patnosê jî, yek ji wan bajarên ku, li ber xwe dide ye. Nemaze, ji 15'ê Tebaxê û vir ve gelê Patnosê baş da xuyakirin ku bi doza xwe ve hatiye girêdan û bi bîr û bawerî ye.

Roja 15'ê Tebaxê esnafên Patnosê, ji bo pîrozkirina salvegera destpêka şerê gerîla, dereben (kepenkên) xwe girtin. Eynî şev saet di 10 a de, gerîla jî girte ser hêzên dewletê û hejmarek mezin ji wan kuştin, lê dewletê kuştî û birîndarên xwe veşart.

Roja 25'ê Tebaxê, li dij qetlîama Şirnexê, esnafên Patnosê dîsa dikanên xwe girtin û hovîtiya dewleta Tirk protesto kirin.

Patnosê bi her awayî ketiye nav têkoşîna neteweyî û her roj, xort û keçên ciwanên ji Patnosê, ji gundên Patnosê dikevin nav refên gerîla.

# HAWAR

**Dilbixwîn**

## Xwendina kurdî welatparêzî ye!

Weke ku ez destên xwe têxime histûyê wî û biguvêşim, sor bû, mor bû, çavên xwe berdanê jêr û got:

Biborîne, ez bi kurdî nizanim bixwînim.

Ez amade me, te di hefteyekê de hînî kurdî bikim, hem binivîsînî, hem jî bixwînî.

Na...na, dem derbas bûye, ez li ku hînbûna kurdî li ku!

Bi vî awahî xwe xelas kir û rojnameya Welat ji dest min negirt.

Nezanîn ne pirsgirêkeke gelekî mezin e, pirsgirêka herî mezin ew e ku, mirov nizanibe û nexwaze hîn bibe. Em pirr li wan kesên ku nizanin bi kurdî bixwînin û binivîsînin nagirin, lê dîsa jî cihê mixabiniyê ye ku, civakeke wiha destê xwe dirêjî kûraniya dîrokê dike, nizanibe bi zimanê xwe bixwîne, em ji dil bang li wan dikin: "Werin hînî zimanê xwe bibin!" Dîsa jî nayên. Ji me bêhtir ji dijmin bawer dikin. Gelo ev ne nexweşî ye?

***Civakeke wiha destê xwe dirêjî kûraniya dîrokê dike, nizanibe bi zimanê xwe bixwîne, em ji dil bang li wan dikin: "Werin hînî zimanê xwe bibin!" Dîsa jî nayên. Ji me bêhtir ji dijmin bawer dikin. Gelo ev ne nexweşî ye?***

Di nêrîna min de ev nexweşiyeke ketiye nava civaka me. Çawa?

Ev bi sedan caran e ku em dikine hawar û haho... rojnameyên Tirkan ên Babialî nexwînin, ew mîna jehrê dikevine nava xwîna we. Rastiyê nabêjin, we dixapînin, derewan dikin, şerê psîkolojîkî ku şaxekî şerê taybetî ye, bi destê me li dijî me didin meşandin... Li radyo û kanalên televîzyona wan temaşe û guhdarî mekin, bila zarokên we kor nebin û şîrên wan ê jehrkirî nemijin, nekin...nekin...nekin!

Hawara me gihişte ezmanê heftan, dîsa jî weke ku em ji kevirekî hişk û bêcan re bibêjin, ev çi nexweşî ye? Li şûna kenalekê çar kanalên televîzyona Tirk, dixin malên xwe, li şûna rojnameyekê sê-çar rojnameyên Babialî dikirrin. Tiştê Tirkan bi wan mîna şekirê Şamê ye, gelekî şêrîn e.

"Hûn ji tiştekî re nabin, hûn bi kêrî tiştekî nayên, rewşenbîrên xelkê pirtûkxaneyên xwe ji roman, çîrok, kovar û rojnameyan dagirtine... hûn nikarin rojnameyeke kurdî ji me re derxin, ev çi rewşenbîrî ye."

Bi vî awahî rewşenbîrên Kurd rexne dikirin û dikin jî. Rast e, ez jî tevlî gotinê dibim, rewşenbîrên me li pişt şoreşê dimeşin. Di gelek aliyan de şivanekî Kurd rola xwe di şoreşê de ji wan bêhtir dilîze, di çarçoveke teng de, yan jî fireh de ev rastiyek e. Baş e, rexne hate pejirandin, lê...

Vayê, me rojnameya Welat deranî, bi peryodîkî her hefte tê weşandin, di dîroka gelê Kurd de, ev tiştekî nû ye, hûn ji bo çi naxwînin? Bi hinceta "em bi kurdî nizanin" hûn nizanin, hûn ji rastiyê direvin, eger nizanin werin hîn bibin. Li Ewrûpa komeleyên kurdî yên çandî hene, herin li wir hîn bibin. Li Tirkiyê û Kurdistanê cihên fêrkirina kurdî hene, hûn çima xwe hîn nakin.

Ev jî bila bimîne li aliyekî, eger hûn bi kurdî nizanin, fermo ji we re Gündem, Y.Ülke, bi tirkî ne, hûn weke zimanê xwe dizanin bixwînin, na! Vê jî nakin, diçin her rojê sê-çar rojnameyên dijmin dikirrin û xwe li ser piştê davêjin û nûçeyên li ser "terorîstan" dixwînin. Ev çi nexweşî ye! Ji bo çi, ewqasî em bi dijmin ve hatine girêdan?

Bi rastî mirov diheyîre, civakeke bê çav e, nabîne. Kerr e, nabihîse. Naxwaze bibîne, naxwaze bibihîse jî, em çawa bikin? Em Rewşen û Welat derdixin, dibêjin em nizanin bi kurdî bixwînin û xwe xelas dikin. Em Gündem û Ülke derdixin dibêjin em ne vala ne, em nikarin xwe ji bo xwendina rojnameyan vala bikin. Di pişt re jî diçin li ser bayiyan ji bo kirrîna rojnameyên Babialî li hev diqelibin, çi derman dikare ji vê nexweşiyê re çareyekê bibîne?

Werin hawarê, tu nema em di nava gemara Hürriyet, Sabah û Türkiyê de bifetisin.

# Ji aliyekî din ve Amerîka

**Gavan Koçer**

Şeva 15'ê Tebaxê wêneguhêzan (TV) rastiyekê dramatîkî anî ber çavên temaşevanan. Yekê Danîmarkayî di sala 1970 an de bar dike diçe Amerîkayê. Deh sal li wir dimîne. Li taxekê desteng dibe mêvanê malbatekê reş. Bi alîkariya vê malbatê, reş û sipiyên herêmê dinase. Têkiliyên xwe bi wan re zixm dike. Bi wan re dixwe, radibe û radizê. Jiyana wî dibe beşek ji jiyana wan. Danîmarkayî di vê demê de, li ser jiyana belengazan gelekî wêneyan dikişîne. Paşê vedigere welatê xwe.

Di sala 1991 an de cardin vedigere Amerîkayê, ku bi van wêneyan marezek (sergiyek) veke. Ji bo vî jî, li dû hevalên xwe yên kevn dikeve ku li ser rewşa wan, a îroyîn bi wan re hevpeyvînan çêbike. Li gor wî, cûdabûna reş û sipiyan a îroyîn ji dema koledariyê xirabtir e.

Danîmarkayî di destpêka nivîska (belge) xwe de nîjadperestiyê şîrove dike: Li Amerîkayê sazûmaneke wiha geşbûye yên ku ji nû ve diçin, li wir an dibin nîjadperest ji bo sipîyan an jî, ji bo reşan. Ji ber ku avahiya civakî lêhatineke (şansekê) din nade wan. Ên ku ji derve tên sipî dibin ew dizanin, reş dibin ew dizanin, vê rastiyê pirr zû dibînin.

Li gor wî li Amerîkaya Yekbûyî du dinyayên bi heralî ve ji hev cûda hatine çêkirin. Dinaya reşan û sipiyan. Ango du civak bi celebên ciyawazî. Her yek li civata xwe dijî û têkiliyên wan jî bi hev tunene. Civata sipî, di bin hoyên kotekî de civata reş helandiye, binca (koka) wî helisandiye. Ew perçiqandiye, bindest kiriye. Stemkariya sedsalan mêjiyê reşan xira kiriye. Bindestî û hoyên kotekî ên bi sedsalan gelê reş kiriye dijminê hev. Lewma, civata reşan xwîna hev dirijînin.

Ji bo endamekî civata Kurd re gotinên jor ne biyan in. Lê, yên ku li der û dorê digerin û pesnê Amerîkayê didin, bila van rastiyên civaka Amerîkayê jî bibînin.

Em ji bo van rastiyan xwendevanan demekê bi pirsên Danîmarkayî û bersivên Amerîkayiyan ve bihêlînin (vana bi tenê çend mînak in);

Çima tu dijitî li malbata xwe dikî?

(Jinekê reş) Ji ber ku malbata min ji min hez nake. Hemû civaka reş wiha ye. Hîsên wan nemane. Ji mirovan hez nakin. Ew pirr sar in. Ez bêkes im. Ka ez bextê xwe ya reş ji kê re vekim?

Ma tu nizanî ji bo gelên bindest destûreke hevpar heye; Xwediyên bi hêz, giyana civak û kesên bindest wêran dikin, giyana wan xira dikin da ku bikaribin wan bi rê ve bibin. Gelê te jî ev hatiye serê wî. Ew bi sedsalan e ku ew hoyên ku gelê te tê de dijî jixwe ne mirovatî, ne jî hezkirinê dihêle. Dibê ku gelê te hîsên hez kirinê winda bikin, lê sedema vî jî sipiyên desthelatdar in.

Na, na gelê sipî tu car ji min re gotinên xirab nabêjin. Ew baş in.

Keçekê reş; Ez hem ji sipiyan, hem jî ji reşan xwî dikim. Ji sipiyan xwî dikim; ji ber ku wan tista me kolandine. Ji reşan xwî dikim; ji ber ku ew reşên ku li ba sipiyan kar digrin, zû reşan jibîr dikin û dibin sipî.

Jinekê reş;

(Bi girînê, kul û derdên xwe rêz dike) Min bi xwe sê kes kêr kirine. Eza reben çi bikim, jiyana me ya rojîn wiha derbas dibe.

Mêrekî reş;

Keko! bê hejmar hevalên min hatin kuştin. Navên wan bîst kesên ku tên bîra min....


Keçekê sipî (bi kelgirînî);

Ez bi xwe dixwazim ji bo reşan kar bikim. Lê, ev kara karê hîngehan (enstîtuyan) e. Hîngehên wiha tune ne. Lewma jî xebata meya şexsî dimîne. Ew jî, ji tirsan nayê cih. Ji ber ku ji zor û aloziyan mirov newêre li rêyan bigere. Tu nizanî ka tu kengê tê kuştin. Civaka me bûye civaka bi zorê.

Belê, dîmena (menzeraya) jorîn ne ji çerxa navîn e, a çerxa îroyîn, ê 1992 an e ye. Ev bûyerên jorîn li Amerîkayê "parezgera" dinya meya îroyîn, pêktên.

Em di van bûyeran de rastiyekê dîrokî dibînin. Ew jî ev e: Gelên bindest wilo dikeve ku ew kotekiyên ku desthelatdar tînin serê wan, nabînin. Çi xirabî, bextreşî hebe dikin sûcên xwe.

Îro li tax û kolanên Amerîkayê ne tenê reş, sipî jî bi sed hezaran bêxwedî ne, birçîn e, ciyên wan ê raketinê tune. Mirovên birçî jî karê wan dibe dizî û beredayîtî. Lê, cardin jî, tedayiya mezin li civaka reşan dibe. Ji ber ku civaka reşan civakekî bê rêxistin e. Pirsgirêk û dubendî di civakekî sazkirî de çareser dibin. Ji bûyerên jorîn jî tê xuyakirin ku civaka reşan hîn neketiye qonaxeke wiha.



Li "welatê milyaketan" bîr û bawerî nemaye. Wêne: Kovara Time

# GOTÎN

**Yaşar Kaya**

## Ziman

Ziman ji bo gelê Kurd çi ye? Ez dixwazim îro, ji bo zimanê kurdî çend gotinan bibêjim. Zimanê me Kurdan, ev sed sal e, ku ji bo me qedexe ye. Qedexeya ziman, ji bo gelek, dozeke giring e. Qedexeya ziman bi xwe re çi tîne? Dema dewlet ziman qedexe dike, tenê bi wî nasekine. Ku ziman qedexe be, dibistan jî tune, dibistan tune be, pirtûk jî der nakevin, pirtûk der nekevin, ziman pêş ve naçe, li ser dîrok, çand û edebiyat lêkolîn çênabin. Ji ber van e ku koledar berî her tiştî ziman qedexe dikin. Ji bo xebat li ser tiştên din jî, çênebin.

Gelê ku zimanê xwe ji bîr bike, dibe bindest û serê wî berjêr dibe. Bê ziman axaftin nabe, bê ziman çanda neteweyî xwe nû nake, bê ziman tu tişt bi pêş ve naçe. Gotin ew e ku hevalên ciwan, bidin ber çavê xwe, ziman jiyan e, ziman destpêka xelasbûnê ye, ziman deng e, ziman şîn û şayî ye, ziman berxwedan e.

Lê belê koledar zanin ku, ji holê rakirina ziman, kuştina gelan e. Em bala xwe didinê, çiqas gire girên Kurdan, mêrxas û helbestvanên Kurdan hene, tevan gelek rûmet dane zimanê kurdî. Ji xwendayên medreseyan bigirin, heta ronakbîrên Kurdan, kesek tune ku xîreta zimanê xwe ne kişandibe.

Dewleta Roma Reş, ji ber van tiştan zimanê kurdî 70 salî qedexe kir, dê dawiya vî şixulî bê. Kurd dizanin, rabûna qedexeya ziman ne bes e. dibistan û zanîngehên bi kurdî, ji bo me ferz in. Gelê Kurd, zimanê tirkî di dema leşkeriyê de hîn dibe. Ji malbata xwe re, nameyên bi tirkî dinivîse û dişîne. Lê belê, hînbûna tirkî ne hêsan e. Li eskeriyê bi darê zorê tirkî hînî xortên Kurd dikin. Ev jî zilmeke din e.

***Gelê bê ziman lal e, devê wî heye dengê wî tune ye. Ziman haceta (navgîna) yekbûnê ye. Pêwîst e em ji bo zimanê xwe gelek xebatan bikin. Gereke zimanê me, bibe xîreta me û em wê bi pêş ve bibin.***

Xortê Kurdan, ji bo hînbûna zimanê ingilîzî, almanî, an jî zimanekî din ê biyanî, 5-6 salên xwe didin, lê ji bo zimanê xwe yê zikmakî, mehekî jî nadin û naxebitin. Welatparêziya wiha kê dîtiye? Welatparêzî, ji hînbûna zimanê zikmakî destpêdike. Bi zimanê kurdî çiqas pirtûk hene, tev ji alî koledaran ve têne veşartin, an jî şewitandin. Ên ku teze der dikevin jî, ji pirtûkxanan berhev dikin û nahêlin bikevin destê gel.

Gelê bê ziman lal e, devê wî heye dengê wî tune ye. Ziman haceta (navgîna) yekbûnê ye. Pêwîst e em ji bo zimanê xwe gelek xebatan bikin. Gereke zimanê me, bibe xîreta me û em wê bi pêş ve bibin. Pêwîstiyek din jî ev e, gereke Kurdên Rojava, ên Başûr, Bakur û ên li dinyayê belavbûyî, zarava û devokên hevdu bizanibin, ji bo ku, kengê, dema wî hat zimanê xwe bikin yek. Divê ji bo Kurdan zimaneke nivîsanê yê hevbeş hebe û gereke ev armanca me gişa be. Ev doz dozeke bi xêr e.

## Terora Neo-Naziyan

Piştî yekbûna herdû Almanya, livbaziyên Neo-Naziyan jî her diçe zêde dibe. Yekbûna herdu Almanya ruhê Hitler ji nû ve vejand. Neo-Naziyên Alman hem serdestbûna nijada xwe îdia dikin û hem jî li hember gelên biyan ên ku li Almanyayê dijîn radibin.

Di van çend rojên dawî de dîsa êrişên Neo-Naziyan li dijî gelên biyan zêde bûn. Neo-Nazî, hem êrişê qampa penaberan dikin û xesarê didin wan û hem jî kom bi kom êrişê kesên biyan dikin. Wisa bûye ku li hin bajaran gelên biyan êvaran nikarin bigerin.

Li bajarê Rostockê, li ser kirinên Neo-Naziyan gelek kes, komelên demokratîk û sazgehan tevî gelên biyan xwepêşandanek li dar xistin û nîjadperestiya Neo-Naziyan protesto kirin. Lê polis mudexale bi xwepêşandanê kir û di nava polîs û xwepêşandanwanan de lihevxistinek derket. Di vê lihevxistinê de gelek kesên sivîl û polîs birîndar bûn.

Partiyên nîjadperest li Ewrûpayê her diçin xurt dibin, rayên xwe zêde dikin. Lê tu der bi qasî Almanya û Neo-Naziyên wê ku, ji bo gelên biyan bûne xetere (tehlîke) nîn e.

*Serokê Belediya Cizîrê Haşim Haşimî:*

# 'Gelê Cizîrê êdî bi bîr û bawerî û xwedî rêber e'

**Îro namzetê belediyê û hwd. ji nava gel û bi qerara gel têne kifşkirin û neqandin. Tê xuyakirin ku êdî tesîra eşîrtiyê nemaye û hatiye şikandin.**

***Kekê Haşim ji kerema xwe re rewşa belediya Cizîrê hûn karin binin ziman, li ser doh û îro dîtin û ramanên xwe hûn diyar bikin, emê dilxweş bibin?***

-Li ser rewşa belediya Cizîrê, di navbera doh û îro de ez di karim bibêjim ku gelek tişt guheriye.

***Weke çi, di hêla eşîrtî de an na?***

Na, na, ne tenê di hêla eşîrtî de, Belediya Cizîrê jî xwe di gelek hêlan de guhertiye û bi pêş ketiye, a yekemîn, îro Belediya Cizîrê ji destê eşîran derketiye. Beriya ku ez bibime namzet û werim hilbijartin, Belediya Cizîrê di destê eşîran de bû. Wek malbata Şiq û Wesekan gelek deman reîstiya Belediya Cizîrê kirine. Belê, îro namzetê belediyê û hwd. ji nava gel û bi qerara gel têne kifşkirin û neqandin. Tê xuyakirin ku êdî tesîra eşîrtiyê nemaye û hatiye şikandin. Di herêmê de îro rewş wisa ye, namzet bi qerara gel êdî tên kifşkirin.

***Di hilbijartina belediyê de çend parti ketin hilbijartinê, we jî li ser navê partiyê namzetiya xwe da xuyakirin an hûn serbixwe ketin hilbijartinê?***

-Malbata Şiqan ji DYPê, ya Wesekan jî SHP ê û Nurettin Yılmaz jî, ji ANAP ê namzetiya xwe dan kifşkirin, min jî namzetiya xwe ji partiya Refahê da xuyakirin. Ne ku dîtin û ramana min weke Refahê bû, heke min namzetiya xwe serbixwe daniya ez serfiraz nedibûm, di namzetiya serbixwe de gelek hîle dihate kirin, mînakekê ji hilbijartina Nisêbînê ez karim bidim. Bahyettin Ayyıldız jî, namzetiya xwe serbixwe danî, bi rastî di hilbijartinê de Bahyettin serfiraz bû, lê bi fen û fûtan jê standin. Belê îro gelê Kurd raya xwe nade partiyan, gelê Kurd êdî hişyar, zana û bi bîr û bawerî ye. Ji ber ku îro xwedî û rêber ji gelê Kurd re derketin e, rêça rind û bi rûmet şanî gel didin.

***Dema ku malbata Wesekan û Şiqan reîsê belediyê bûn, aboriya belediyê çawa bû, mehanê (meaş) karkeran didane wan? Weke çi kar û xebatê, ji gelê Cizîrê re kirin?***

-Neh sal û nîv malbata Wesekan reîstiya belediyê kirin. Di wan salan de 5 milyar û 250 milyon deyn hiştibûn. 8 meh mehanê Karmend (memur) an, 9 meh jî yê karkeran nedabûne wan, min belediye di vê rewşa xerab de stand. Îro xwestina gelê Cizîrê ya ferz ev e. 70 hezar mirov bê av û şerpeze ne. Îro hatina vê avê di destê Iller Bankası de ye. Mudurê giştî Seyhan Başoğlu, ez dema çûme cem, wiha ji min re got: "Bajarê Cizîrê cihê şer e, cihê herbê ye, ev alîkariya ku em bi we re bikin tev dihere ji PKK'ê re," Lê bi rastî jî tiştekî wisa nîne û tevde jî derew in. Heke alîkarî were kirin ev ji belediya Cizîrê û gelê Cizîrê re ye. Bê dewlet çawa li belediyê metropolan xwedî derdikeve, giring e ku li belediya me jî wisa xwedî derkeve. Heke dibêjin biratî, bila dewlet destê xwe deyne ser wijdanê xwe û biaxive. Îro rê û sikakên (kuçên) Cizîrê tev xerabe ne. Bijîşkê (doxtor) me, nexweşxanê me nînin, karistanên (fabrîqe) me nînin, a ferz ava me nîne. Îmkan û hêza belediyê têra evqas tiştan nake û nikare pêk bîne. Belediya Fraybûtê li Almanya, bi alîkariya Kurdên wê derê destê xwe bi dostanî dirêjî me kirin û 37 hezar marq ji me re şandin, ji bo em nexweşxaneyekê çêbikin. Soz û peymanên hikûmeta qoalîsyonê tev virr in. Yek ji wan sozên xwe neanîne cih. Bilakîs zilm û zorê, hejarî û birakujiyê anî, herêmê kirin dojeh.

***Hevpeyvîn: Ş. Arjen***



*(Wêne: Ali Manaz)*

## Mekişîne lo!

Kaloyê Amedî, li ber dîwêr rûniştiye, pişta xwe daye dîwêr. Ji alîkî ve xwe daye beroşk, ji alîkî ve jî, qutiya xwe ya çixarê derxistiye, ji xwe re çixarek qaçax dipêçe. Di dest de jî, tizbiya not û neh libî heye. A ku pê wird tên kişandin.

Gava dibîne wênekêş wêneyê wî dikişîne, bi lez destê xwe dide ber rûyê xwe. Kalo naxwaze wêneyê wî bê kişandin. Hûn zanin çima? Lewre li gorî îslamê wênekişandin heram e lewma.

## Kî çi dibêje?

Erê em dereng mane di mesela Kurdî de, lê mirov ji ku dera zirarê vegere kar e.

***Güngör Mengi***

Wek gef (tehdît) pêjkirina neteweperestiya Tirk wê bibe sebebê înşakirina neteweperestiya Kurd

***Güngör Mengi***

Bila Şirnex ji me re bibe ders. Pirsa Kurdî tenê, bi darê zorê çareser nabe.

***Cengiz Çandar***

Parçeyekî welatê me, li ber çavê me ji destê me diçe, lîderên me hê jî, her yek ji wan li têlekî dixe.

***Ahmet Vardar***

Me berê jî gerîna awartê ceriband, lê tu feyda wê çênebû, zêrara wê gihîşteme.

***Alparslan Türkeş***

Ku ev bûyer wiha dom bikin, emê mecbûr bibin bi PKK'ê re, li ser masê rûnin

***M. Ali Birand.***

Ji zû ve, em İsmet Sezgîn nas dikin, şexsiyeta wî jî wek rûyê wî paqij e.

***Oktay Ekşi***

"PKK muxbîran dikuje"

***Süleyman Demirel***

## Dengbêja Koma Çiya Besê di bin çav de

Dengbêja Koma Çiya Beser Şahin di roja 29.08.1992 an de, li mala xwe, saet di yekê şevê de tevî mêvana xwe Güler Çelik ku xebatkarê kovara Özgür Halkê ye, ji hêla polîsan ve hatin binçavkirin.

Di vê cerdê (baskın) de polîs dest didin ser eşyayên wê yên taybetî, pirtûk, wêne û qasetên wê yên xebatê. Mala wê jî, berî nava hev didin, sero bino dikin.

Endama Koma Çiya Beser Şahin tevî koma xwe xebatên xwe yên çandî û muzîkî, li Navenda Çanda Mezopotamyayê didomîne. Li ser girtina Beser Şahin Rêveberiya Navenda Çanda Mezopotamya ji bo çapemeniyê daxuyaniyek kir û şandin rojnameyan.

Di daxuyaniyê de Rêveberiya Mezopotamyayê hem pest û pêkutiya dewletê ya li ser gelê Kurd û hem jî girtina hunermenda xwe Beser Şahin, protesto dikin.

# Kongra HEP'ê

Li gor ku tê xwuyakirin ev kongre wê ji wan kongreyên ku heta îro hatine kirin cudatir be. HEP di vê kongra xwe de dê hin guhertinan bike.

Li gor ku karbidestên HEP'ê dibêjin guhertinên di rêznamê (Tüzük) de werin kirin, ji bo dageriyeke girohî ku (kollektif) were damazrandinêye.

Guhertinên ku di bernamê de werin kirinê:

1 Rewşa tahlîla dinyayê wê bê ronîkirin,


2 Pirsgirêka Kurd û gelên din bi awakî firehî wê bê vekolandin.

Mebusên ku berê di partiya Sosyal demokrat a gelparêz (SHP) de bûn di vê kongrê de, wê karibin di organên rêvebirinê de cih bistînin. Yek ji tiştê ku HEP giring dibîne têkiliyên dîplomatîk in.

HEP dixwaze pêwendiyan bi sazgehên demokratîk ên navneteweyî ên ku li ser gelş û gelemşên kurdî disekinin re deyne.

# Hin adetên Kurdên Êzîdî

AMED Û ZÎNÊ



Pîroziya Kurdên Êzîdî "LALIŞ"

Li ser Êzîdiyan û Êzdîtiyê bi sedan pirtûk û lêkolîn hatine kirin. Tenê sal têrê dikin ku mirov wan pirtûkan tevan bixwîne. Êdî mirov gava têzekê li ser Êzdîtiyê bike, divê şaxekî jê bigre, hingî ku pirr li ser hatiye nivîsandin. Biyaniyan çi Ewrûpî bin, çi ne Ewrûpî bin ola Kurdên Êzîdî bala wan ji zû ve kişandiye. Kurd di Rojhilata Navîn de miletekî Îrani yê kevnar e û çi miletên hene tev ji çand û olên xelkê tesîr standine. Mirov dikare bibêje ku ew mînak hema hema nema ne, têkeliyên miletên din bûne. Êzîbûna parek ji Kurdan biyanî germ kirin û têve dan ku li ser Êzdiyan bikolin û dirûvên kevin, bi taybetî li ser Zerdeştiyê, tê de bibînin. Pirtûka her a dawîn ku li ser Êzdiyan belav bûyî ya nivîskarê **Amerîkî, John S. Guest, e** (London, 1987, 299 rûpel). Camêrî bi salan bi Êzdiyan re jiyaye. Niha gelek nivîskar wekî R. Cîzre û yên mayîn lêkolînan li ser Êzdiyan amade dikin.

Gava mirov bixwaze Êzdîtiyê bi kûranî binase, divê mirov ji nerît û adetên Êzdiyan dest pê bike. Ew gelek şop û delavan li ber mirovan vedikin. Gelek nêrîn li ser kok û ola Êzdiyan hatine pêşkêş kirin. Nêrîna her a şaş gava tesîra Erebekî li ser Êzdiyan dibe sedemê ku Êzdîtiyê gişî bi Misilmantiyê ve girêdin. Dijminên Kurdan, dixwazin rastiya miletê Kurd veşêrin, vî miletê kevnar hota (winda) bikin, wekî çawa îro bi werîsê Zazatiyê jî dilîzin. Dijminên me dikarin bi armancên siyasî, bi derewan, bi xapan, bi navê biratiya Misilmantî û bi navê Cîhad û hwd... bangî Kurdên Misilman bikin û xwe nêzîk wan bikin, lê Kurdên Êzîdî? Kurdên Êzîdî ji Kurdî pê ve zimanekî dinê nizanin; nimêjên wan, adetên wan, qewlên wan, lavijên wan giş bi Kurdî ne. Mejî kêmî ye gava Erebên Îraqê wan Ereb bibînin, an Ermeniyên Rewanê wan ne Kurd bibînin.



Kurdekî Êzîdî

### OLA ÊZÎDÎ Û ZERDEŞTÎ


Ola Êzdîtiyê bingeha xwe ji **Zerdeştiyê** distîne. Lê kartêkirina olên dinê pirr li ser bûye. Çiyayên Kurdistanê ew ji Îrantiya Kurdan karibûye biparêze. Çiyayên Kurdistanê hebûna Kurdan bi xwe heta îro parastiye. Gotina "Êzdî, Yezîd" bi xwe ji gotina Avestayî **"Yezete"** (peristin, parastin) hatiye. **"Yezdî"** mezinê firîşteyên ola Zerdeşt e. Carna bi şêweyê kotir, carna bi şêweyê helo derdikeve. Ev firîşte li nav rojê, hîvê û stêrkan dijî. Nimûneka dinê jî: gotina "dîn" parek ji Kurdên Êzîdî "dên" lêv dikin, wekî çawa di **Avesta** de hatiye.

Kurdên Êzîdî di destpêka biharê de cejnekê pîroz dikin, derdikeve ciyekî, pirraniya wê **Zaret** e. Hinek jî jê re dibêjin **"Cumayê"**. Hinên wan berê bi dizî diçûn, cejna xwe pîroz dikirin. Bi gumana me, ew cejin Newroz e. Îro, Êzdiyên Şengalê êdî bê tirs ji wê cejnê re dibêjin **"Newroz"**. Eger em ne şaş bin jî, hin Kurdên ku ne ji mêj de Misilman bûne, ew jî vê cejnê pîroz dikin. Gundî di nava xwe de rojekê dibijêrin, yek radibe ser xaniyekî, bang li gundiyan dike ku sibe wê herine cejnê pîroz bikin. Milet qurbanan û dahol û zurnê bi xwe re dibin; li hêlekê keçik dîlanê dikin, li hêlekê, zarok ji xwe re dilîzin, li hêla dinê mêr û jin govendan digrin û hwd... Li dawiyê, tev bi hev re nan dixwin.

Newroz, ji koka xwe ve ne efsane ye. Efsanebûna Newrozê ji **Şahnama Firdewsî** de xwe dizane. **Çîroka Kawa** di Şahnamê de derdikeve. Îrannasê navdar, **CharlesHenri de Fouchecour,** li ser Newrozê wiha dinivîsîne:

### CEJNA NEWROZÊ

"Zerdeşt rêbertiya miletekî koçer dikir, di welatekî sar de bi çêrandina pez dijiya. Milet tenê du demsal nas dikirin: zivistan û havîn. Avakarê olparêz (Zerdeşt) Newroz çêkir. Newroz ev cejna mezin destpêka biharê diyar dikir, cejneka tim a bi nav û deng e. Lê sersal di payîzê de dest pê dikir. Di bin bandûra Misirê de, di sedê 5 an de berî Zayînê, sersal li berçilê de (dêcembre) dest pê dikir. Paşê, sersala **Babilonî** ciyê wê girt û Newroz ji dema Dariyos de sersal e" (Histotre des Moeurs, III, Encyclopédie de la Pléiade, rûpel 10781079 binêrin.)"



Kurdên Êzîdî di dema ayînekê de.

Di vê gotara xwe de, em tenê li ser nerît û adetên Êzdiyan divindin (disekinin):

Êzîdî ji roja sêşemê, piştî nîvro ta roja çarşemê piştî nîvro kelê kuç nakin; ne kincan (cilan) û ne jî seriyan dişon. Li ba wan guneheki pirr mezin e eger mirov serê xwe êvara çarşemê bişo, an bobelatek (qeza), an belak dê were serê mirov.


Êzîdî kincên (cilên) kesk li xwe nakin. Ew yeka hanê guneheki pirr mezin dibînin û henekên xwe pê dikin û dibêjin: ew rengê derpiyê pîrên Misilmana ye. Li sala 1967, li gundê Şadêrê, Çiyayên Kurd, li BaşûrRojavayê Kurdistanê, xortek nexweş bû, "tentûr" (mirovekî xeyalî) dihatê. Piştî ku Şêxên Êzdiyan hatin ser, gotin ku mala wan kincên kesk li xwe dikin. Çi tiştên kesk di malê de hebûn tev avêtin.

Neqtik



Bi hêza xwe bimeşe. Ev e riya serkevtin û azadiyê.

**Ernesto che Guevara**



# Zafera Pîrûs

24'ê Tebaxê saet 20.20 de di televîzyona Showê de li ser qetlîama Şirnexê rojnamevan Yalçın Doğan, Uğur Dündar û Mehmet Altan di gel waliyê herêmê Ünal Erkan û qumandarê ewlekariya herêmê Necati Özgen re hevpeyvîn kirin. Berî hevpeyvînê di nava bajêr de geriyan û hin pirs ji hin kesan kirin. Yek ji van yüzbaşiyek bû. Bejn û bala wî rengê leşkerên moxolên talanker dihanî bîra mirov. Hemû eşkalên xwe ve, te dê bigota qesabê mirovan e. Kuştina çend mirovên bê guneh û ya hin heywanan ew zêde serxweş kiribû. Di bersivekê de digote Uğur Dündar:

Ordiyê (Artêşa Tirk) di vî şerî de zafer qezenç kiriye.

Hem ev gotina wî, hem jî rewşa lehengiya ew di nav de "zafera Pîrûs" anî bîra min.

71 sal beriya zayînê, di nav Yewnaniyan de qumandarek hebû, jê re digotin Pîrûs. Di mêraniyê de kesek di ser xwe de nedidît. Di şer de heq û neheqî nedipirsî. A giring ji bo wî ew bû ku biketa şer, bi şûrê xwe mirov bikuştana û nav û dengê wî derketa.

Wî rojek li hemberê Romayiyan şerekî neheq îlan kir. Leşkerê xwe bi rê xist. Mirovekî mezin û eqilmend ê ku kurê wî jî, leşker bû, hate nik (ba wî) Pîrûs û gote:

Di vî şerî de bi min em li hemberê Romayiyan de neheq'in. Ji ber vê yekê heyf e tu van xortan bidî kuştin. Pîrûs jî wekî yuzbaşî yê Şirnexê xwe dîtibû.

Qey hatiye bihîstin ku ez di şer de têk biçim. Qofa neke. Di vî şerî de jî zafer her a min e. Çawa Tirk dibêjin "Tirkek berdêlê dinyayê ye", wî jî xwe egîd û mêrxasê nav welatan nas dikir. Di dawiya şer de, bi rastî jî Romayiyan şikandin. Lê wî jî pirraniya mêrxasên xwe berze kirin. Ew û çend hevalên xwe bi birîndarî û belengazî vegeriyane Atîna. Di şer de kurê pîremêrî jî, hat kuştin. Di vegerê de zilam çû ser rêka wî û careke din gote:

Min gote te, di vî şerî de tu heqiya me nîn e.

Pîrûs careke din jî xwe ne qulipî û ew kêmasî û xeletiyên kirî, qebil nekir.

Ma serkevtin nebû ya min. Ev zafer e, çiqas bi kêmasî be jî, ji bo min bes e.

Lê hin qatil û qesabên hemdem baş bizanin ku ev Pîrûs'ê xwe mêrxas dizanî, çend salan şûn ve di bajarekê de kete şerê kolanê û şûrê xwe kêşa û mêr dikuştin. Pîrejinekê ser banî kerpîçek daweşande nava serê wî û kuşt. Ev lehengê zemanî bi destê pîrejinekê ve hate kuştin.

Gotineke pêşiya heye dibên: "Hemû tişt bi ziravî, lê însan bi stûrî diqete". Dîroka însana bi van mînakan tijî ne. Neviyên Osmaniyan ên sax, beriya çend rojan derketin televîzyonê. Hin ji wan ewqas xîzan bûbûn, kolanên Parîs'ê paqij dikirin.

Gotineke din a Kurdan dibêje: "Ne wêra kerê, hilda paliyê." Hêzên dewletê yên çekdar jî nikarin li hember çekdarên PKK'ê şer bikin, tola kuştî û birîndarên xwe bi bajarî û gundiyên bê belengaz distînin.

Wan qetlîamên ku li ser welatiyên bê çek didomînin û dibên "Me zafer qezenç kir." Lê wan dîroka Pîrûs ên zirtker û kuştina wî ya bi destê pîrejinekê ne bihîstiye. Niha jî serbazên Tirk li ser mejiyê Cengizhan, Hulagu, Kuyucu Murad Paşa, Abdullah Muğlalı û Evren in. Naxwazin guherînên dinyayê bînin ber çavê xwe. Rastî jî çaxên borî de bi mîlyona Kurd kuştine. Lê ne dinya dinyaya berê ye, ne jî Kurd Kurdên berê ne. Roj bi roj Îdrîsê Bedlîsî û Giyap Axa yên Kurdan kêm dibin, yekîtiya wan pêşve diçe.

*Behzad Berçelanî*

# TÎR



**Musa Anter**

## Di belgeyên Îngilîzan de Kurdistan

Sernivîsa me, navê pirtûkê ye. Ev pirtûk Ahmet Mesut, ji îngilîzî wergerandiye tirkî. Ev pirtûk di sala 1992 an de di nav weşanên Dozê de hatiye weşandin.

Ê ma birano! Emê ji we re binivîsîn û bixwînin jî. Ez ji temamê Kurdên xwendevan rica dikim, ku vê pirtûkê bixwînin û qenc bifikirin. Wê çaxê hûnê fêm bikin, bê (ka) li pişt deryayan xelkê ji Kurd û Kurdistanê re çi çalik kolane û li ber me çi xefkan vedane û hê jî vedidin.

Ev pirtûk doza Kurdistanê, ji 1918 an, heta 1958 an dide zanîn. Lê ez dinêrim heta îro jî, ji aliyê Kurdan tiştek ne guheriye.

Pirsek me Kurdan heye "serê xwedî, bêyî xwedî kurr dikin." Ez dinêrim, îro jî dijmin bêyî me ji doza me xeber didin.

> ***Berê jî wiha bû, niha jî wiha ye. Ma kesî dîtiye ku, neyarê mirov tiştek qenc ji bo mirov bixwazin û bikin.***

Berê jî wiha bû, niha jî wiha ye. Ma kesî dîtiye ku, neyarê mirov tiştek qenc ji bo mirov bixwazin û bikin.

Niha ku hûn vê pirtûkê bixwînin, hûnê dost û dijminê xwe baş nas bikin.

Wellahî dostê me qet tunin. Lê hema gotin bûye adet. Pirsek Tirkan heye, bi tirkî "Türkten başka Türkün dostu yoktur." Yanî dibêjin, ji Tirkan pê ve, dostê Tirkan tune ye.

Bi rastî jî wilo ye. Kes dostê Tirkan tune ye, heta ew jî ne dostê xwe ne. Ma Tirkan mala kê xera nekiriye, ku dostê wan hebin? Piştî ewqas zilm zor û tada ku, bi sedsalan, li Ereb, Ecem, Kurd, Yewnan, Bulxar û miletên din kirine, wê kî dostê wan be, bi ser ewqas tiştî de, ma wê hêjî dostê wan hebin?

Em Kurd mabûn. Me digot qey, tiştê ku çû, jixwe çû. Îro welatê me yek e. Ku ji dilê safî em biratiyê bi hev re bikin, emê herdu alî jî rehet bibin. Lê ma ka? De bêjin, em Kurd çawa bi İsmet Sezgin û qumandarê Şirnexê re biratiyê bikin?

Devê wan bişkê, kengê devê xwe vedikin, li ser pelixandina Kurdan wek guran dizûrin.

Hevalno! Ez ne reklamkarê firotina tişta me. Gereke hûn min nas bikin. Ez di vir de, reklama doza xwe dikim. Min divê ku kal û xortên Kurdan giş, vê pirtûkê qenc bixwînin. Buhayê wê jî, heqê mirîşkekê ye.

## Kêfa Özal neynin Welat bixwînin



Turgut Özal dibêje: "Ji xwe kurdî hatiye jibîrkirin. De bila hema zimanê kurdî serbest be û rojnameyên kurdî derkevin, çawa be kes naxwîne."
Em jî dibêjin: "Kêfa Özal neynin, Welat bixwînin"

# Li ser doza Kurdistanê siya xiyanetê



Gel dimeşe. Li pêş, serok û li dû, bi hezaran mirovên dilsoz û canfeda. Ber bi şoreşê ve dimeşin.

2'yê îlonê, bi berbanga sibehê re nezîkî 30 hezar leşkerên Tirk, di binê kumandariya Tuxgeneral Metin Sayar de, dest bi operasyonên leşkerî kirin, pêşî çiyayê cûdî û derdora çiya bombebaran kirin û dû re derbasî wî aliyê sînor bûn. Li gor agahdariyên ji nûçevanên me, yên Kurdistanê, gihîştine destê me, roja çarşemê Arteşa Tirk, pênc kîlometre kete nav Kurdistana Başûr. Herêmên ku lê operasyon çêdikin ji rojnamevanan re girtî ye. Ji ber vê yekê agahdariyên dorfireh nagihîjin me. Bes, li gor xwendevanên me yên li gundên nezikî sînor rûdinin, hem bombebarankirina çiyayê Cûdî, hem jî tevgera Arteşa Tirk a wî aliyê sînor dom dike, û heta niha hejmarek mezin leşkerên Tirk, di kemînên gerîlayan de hatine kuştin.

Cerdevanên ji eşîra pinyanîş û Kaşûrî jî, beşdarî van operosyonan dibin û heta niha 10 cerdevan jî di, şer de birîndar bûne.

Roja 2'yê îlonê, Artêşa Tirk bi balefiran gundên Kurdistana Bakur dan ber bombeyan û bi tank û panzerên xwe ve derbasî Kurdistana Başûr bû. Serdana Berzanî û Telabanî û ketina Artêşa Tirk a nav Kurdistana Başûr, dîsa li hev rast hatin. Berzanî û Telabanî bi navê "têkiliyên dîplomatîk", ji bo rêlêgirtina têkoşîna PKK'ê, bi serokên dewleta Tirk re planan çêdikin. Dewleta Tirk dixwaze rêxistinên feodal bixapîne û berê wan bide PKK'ê. Pêşengiya van rêxistinên feodal jî PDK û YNK dikin.

# Kî kê dixapîne?

Roja 1'ê îlonê serokên PDK'ê û YNK'ê Mesut Berzanî û Celal Telabanî hatin Tirkiyê. Roja 2' yê îlonê jî bi rayedarên Tirkiyê re rûniştin, li ser pirs û meselên xwe yên girîng peyivîn û bi hev şêwirîn.

Herdu lîderên Kurdên Kurdistana Başûr pêşî bi wezîrê Karê Derve Hikmet Çetin re rûniştin û bi hev şêwirîn.Roja 2'ê îlonê jî Berzanî , Telabanî û berdevkê wî, Serçil Kazaz, Serokwezîrê Tirkiyê, Süleyman Demirel dîtin û pê re peyivîn. Piştî van rûniştinan, li ser pirsên rojnamevanan berdevkê Telabanî, Serçil Kazaz ev daxuyanî derpêş kir. "Danû standinên me bi rayedarên Tirkiyê re di hewayeke dostane de çêbûn. Di hemû mijar û pisgirêkan de, em bi berpirsyarên Tirkiyê re hemfikir in."

Li ser pirsa rojnamevanekî Ajansa Anatolê ku, ji Serçil Kazaz pirsî ka wê karibin tevger û êrîşên PKK'ê bisekinînin û sekinandina êrîşên PKK'ê bi riya diyalogên bi serokê PKK'ê Öcalan re mumkun e an na, Serçil Kazaz wiha bersiv da. "Li Kurdistana Başûr her tişt wê bikeve bin kontrola pêşmergê cepha Kurdistanê, û em rê nadin PKK'ê ku lebatên çekdarî pêk bîne û xwe di nav axa me de veşêre. Bi serokê PKK'ê Apo re jî tiştekî ku em bipeyivîn nîn e, ji ber ku pê re dema peyivînê temam bûye.

Li ser pirsa rojnamevanekî, Telabanî jî wiha peyivî "Li Iraqa Bakur wê nîzam û rêkûpekî bi çê be. Pewist nake ku leşkerên biyanî li herêmê cîwar bibin. Pêşmergên cepha Kurdistanê tenê, wê li herêmê bimînin û nîzamê çêbikin.

"Ji bo bidestxistina gerilayên PKK'ê jî, pewist nake ku Artêşa Tirk herêma me bombe bike."

Telabanî derheqê operasyonên Tirkiyê, yên wî aliyê sînor de jî gotinên xwe wiha domandin." Niha , Arteşa Tirk tu operasyonên leşkerî di herêma me de pêk nayne."

Bes, dema Telabanî ev gotîn dikirin, Arteşa Tirk dest bi operasyonê kiribû jî. Di ser van gotînên wî re hîna çend saet derbas nebûbûn, ji nûçevanên me yên Kurdistanê xeber hat ku, Arteşa Tirk pênc kîlo metre ketiye nav Kurdistana Başûr.

Tekilî û daxuyaniyên Telabanî û Berzanê çend pirsan di mejiyê mirov de çêdike. An ev serokên Kurdistana Başûr, haya wan ji teştekî tune û tên xapandin an jî bi zanebûn gelê Kurd dixapînin.

Roja 2'ê îlonê, piştî rûniştina bi Demirel re Telabanî û Berzanî tevî serokên çend partiyên Iraqê, yên muhalîf, bi Serokkomarê Tirkiyê, Turgut Özal re jî rûniştin û li ser rewşa Iraqê û Rojhilata Navîn sekinîn.

Di vê rûniştinê de jî hemû aliyan baweriya xwe bi hev û bi Dewleta Tirk anîn ziman.

Li ser pirsa rojnamevanekî Ajansa Anatolê Telabanî digot: " Arteşa Tirk, niha tu oparasyonên leşkerî di herêma me de pêk naynê." Bes dema Telabanî ev gotin dikirin, Arteşa Tirk pênc km, ketibû nav axa Kurdistana Başûr.

Tekilî û gotinên Telabanî û Berzanî yên bi Tirkiyê û dewletên imperyalîst re pirsên girîng di mejiyê mirov de çêdikin.

An heya van serokên Kurdistana Başûr ji tişteki tune, ji siyasetê tu tişt fam nakin û tên xapandin an jî, bi zanebûn gelê Kurd dixapînin û Kurdistan dixin bin destê dijmin.

ROJEVA WELÊT

# Mejiyên eşîrî û dîplomasî

Di serê meha îlonê de Celal Telabanî û Mesût Berzanî careke din, xwe xemilandin û ketin ser riya Enqerê. Li Enqerê, Hikmet Çetin bi serdana wan kêfxweşiya xwe diyar kir û roja 2'ê îlonê birin cem Serokwezîrê Tirkiyê Demirel dûrê jî cem Serokkomarê xwe, Turgut Özal. Bi hev re rûniştin, kefweşî li hev dan û xêrxwazî û hestên dostaniyê ji bo hev anîn ziman. Piştî van danûstandinan, Telabanî li ser pirsa rojnamevanekî got: "Arteşa Tirk nakeve Kurdistana Başûr."

Em nizanin, kî kê dixapîne? Gelo serokên Dewleta Tirk serokên Kurdistana Başûr dixapînin û bi wan dileyîzin an jî, Telabanî û Berzanî gelê Kurd bi dest xwe dispêrin Artêşa Tirk. Mafê tu kesî tune axa Kurdistanê ya ku bi xwîna şehîdan hatiye avdan, pêşkêşî arteşên dagirker û xwînmij bike.

Em nizanin ev çi rastlêhatin e?

Çiqas cara ku Telabanî û Berzanî tên Enqerê tewaf dikin, Artêşa Tirk bi hatina wan re, digire ser Kurdistana Başûr. Mirov bê hemdê xwe ji xwe dipirse "Gelo ev serokên Kurdan" li pişt deriyan, bi rêvebirên Dewleta Tirk re çi dikin; bi MİT'a Tirkiyê re çi dipeyivin?

Em nizanin, dewleta Tirk wan dixapîne an jî ev serok eşîr xwe dixapînin?

Kî kê dixapîne bila bixapîne, bes gelê kurd êdî naxwaza were xapandin. Ji ber ku heta îro, ji qetlîaman pirr tişt hîn bûye û hişyar bûye û bi hêza xwe bawer e; ne bi tu hezên dagirker. Gelê Kurd dixwaze û hewl dide ku, xwe bi destê xwe xelas bike, dizane ku tekilîyen bi dagirkeran re wî xelas nake. Ji ber vê yekê û gelek tiştên din, mafê tu kesî tune bi navê tekilîyên dîplomatik xaka Kurdistanê pêşkêşî Arteşên dagirker bike û gelê Kurd bispêre wan. Artêşeke ku di şikeftên Dersimê de jin û zarokên Kurd dişwetandin, artêşeke ku li Koçgirî, Zîlan Diyarbekir, Sason û gelek deverên din ên Kurdistanê bombeyan direşîne û mafê jiyanê ji gelê Kurd re nehiştiye, ne mumkun e bibe dostê Kurdên Başûr. Ew, dijminê gelê Kurd û hemû mirovahiyê ye.

Ev mêjiyên eşîrî û feodal ên ku qetlîama Şirnexê nabînin û Kurdistana Başûr dixin nav lepên Amerikaya imperyalist û bin piyê Artêşa Tirk; divê ji bîr nekin ku herçar perçên Kurdistanê ji bo gelê Kurd yek e. Gelê Kurd, ji bo Kurdistaneke yekbûyî, bê hejmar şehid dane û armanca wî Serxwebûn û azadiya her çar perçeyan e. Ger ev rastî baş bê zanîn, eşkere dibe kî kê dixapîne.

# Çekên gerîla hêviya gelê Kurd e

Meha tebaxê, bi hemû germiya xwe bû tîrêja jiyanek nû ji bo gelê Kurd. Ev tîrêj, îro ronahiya xwe dide ser erîşên gerîla û gerîla jî, ji her demî xurttir, derbên giran li hêzên dewletê dixe. Doz û vîna gel, xwe di çekên gerîla di bi nav dikin û êdî, ji heftsaliyan heta heftê saliyan gelê Kurd xwe bi çekên şorêşê xemilandine.

Dewlet zayîatên xwe, bi derewên ecêb vedîşêre. Bi êrîşên gerîla, bi sedan leşker û cerdevan têne kuştin, lê dewlet weke ku ewqas zayîat gerîla dabe, derewan dike. Bûyera Navşanê (Şemdînli) ku gerîla qereqola Alanê hilweşand, ji bo vê yekê mînakeke baş e.


Hezên dewletê zayîatên xwe, weke yê gerîla nîşan didin û bi van derewan dixwazin moralê gel bîşkînin.

Bûyerên heftiya çûyî, bersiva van derewan didin û wisa xuyaye ku dengê şerek giran jî bi xwe re tînin.

28. 8 .1992: Li Pasûrê,li hêla şekiran, erebeyek leşkerî ket kemîna gerîla, leşkerek mir, yek jî birîndar bû. Polîsek bi navê xwe, Ebubekir Teğin, ku demek berê ji alî gerîla ve hatibû revandin, cesedê wî hate dîtin. Li gundê Bismil Zengilo, muxbîrek bi navê xwe Abdulkadir İldenîz hate kuştîn. Cerdevanan, li navçeya Hîlalê, Şahvan Kara kuştîn. Li Stenbolê keştiyek, ji bo protestokirina bûyera Şirnexê hate şewitandin.

31. 8. 1992: Li Navşan (Şemdînlî) qereqola Alan, ji alî gerîlayan ve hate hilweşandin. Di vê bûyerê de 45 leşker hatin kuştin, 4 gerîla jî mirin. Li gor nûçêyên tên, balefirek jî hate xistin. Li Qersê, gerîla êrîşek bi ser navçeya Ardahan. Gerîla bi roket û çekên giran, avahiyên Emniyetê û qereqola cendirman kutan. Ev êrîş heta sibê domiya.

1. 9. 1992: Li Çepekçûr (Bîngolê) nêzîkî navçeya Dara Henê (Gêncê,) leşker ketin kemina gerîla, 4 leşker û 2 serbaz (astsubay) hatin kuştin, 7 ker jî, birîndar bûn. Li Diyarbekir, depoyên SHELL ê ji alî gerilayan ve hatin şewitandin, nêzîkî 20 hezar bîdon petrol şewitî. Di navbera Mûş û Elezîzê de, trenek ji alî gerîla ve hate qelibandin.



Babindeq û Hîsar bombe dibin.

2. 9. 1992: Li Qersê, erebeyek leşkerî kete kemîna gerîla, 5 leşker hatin kuştin. 5 hizbî kontra, ji alî gerîla ve hatin revandin û dawî cesedên wan, li gundê Aslo ku girêdayî Farqinê ye bi dîrekekê ve daleqandî hat dîtin. Li Qoser (Kızıltepe) 3 muxbîr li gundê Gurmeşe, hatin kuştin. Di navenda Qoserê de jî, 2 endamên hizbî kontra hatin kuştin.

3. 9. 1992: Li Bîngolê gerîla rê girt û 2 leşker kuştin. Gerîla di vê bûyerê de, 2 polîs jî, dîl girtin, otobosa ku leşkeran dibir jî, hate şewitandin. Li İxdirê polîsek hate kuştin. Li Ardahanê 4 gerîla di şerê bi leşkeran de mirin. Li gundekî Farqînê (Silvan), piştî şerê di nav leşker û gerîlayan de, hêzên dewletê gund bi helîkopteran bombe kirin. Di vê bûyerê de, 4 zarok di bin xaniyek de man û mirin. Wekî din, li gundê Hezo Malêgir û li Agirî jî şerê di nav leşker û gerîla de didome. Di derheqê kuştî û birîndaran de nûçe nîn in. 2 gundên di qûntara Cûdî de, bi balefir û topan hatin xerakirin. Di vê bûyerê de, pîrekek bi navê xwe, Bendî Özdemir dema ku leşkeran xaniyê wê şewitandin, ji dûmana agir fetisî. Navê van gundan Banindaq û Hîsar in. Herdu gund jî, piştî bombebaranê ji alî leşkeran ve hatin valakirin.

## Gerîla qereqola Alan weşand

Gerîla di roja 31. 8 .1992 an de girt ser qerola gundê Alan, ku bi Navşanê (şemdînan) ve girêdayî ye. Ev şer nêzîkî 10 saetan domand û dawî qeroala Alan bi temamî hilweşiya. Li gor ên ku li nêzî bûyerê bûne, cesedên 47 leşker û 8 cerdevanan, ji qereqol û mewziyan hatiye derxistin.

Hêzên dewletê, bi panzer, helîkopter û balafiran, bi hawara qereqolê ve diçîn. Gerîla ji wan jî, panzerek îmha dike, helîkopterek jî, ji gulleyên gerîla nasîbê xwe distîne.

Di vê bûyêrê de, 4 gerîla dimrin 12 jî, birîndar dibin. Li gor daxuyaniya serleşkerê gerîla Ferhat (Osman Öcalan), di qeraqolê de 200 leşker hebûne, ji xeynî yên ku de tariya şevê de reviyanê, hemû leşker hatine kuştin û qereqol jî, bi temamî îmha bûye.

Ev bûyer bû sebebê ne xweşiya nav Îran û Tirkiyê. Lewra balafirên Tirkiyê, piştî ku gerîla, hildikişin dikevin nev erdê Îranê, da ku gerîlayan bombe bikin. Di vê navê de qereqolek Îraniyan jî, gullebaran dikin û 5 leşkerên Îranê birîndar dikin.

Hukûmeta Îranê, li ser vê yekê, Tirkiyê protesto kir.

## Li Bakur Tirkiye li Başûr Cepha 'Kurdistanî'

Li Kurdistana Başûr, li bajarê Hewlêrê di 30'yê Tebaxa 1992 an de, ji bo protestokirina qetlîama Şirnexê, meşek çêbû. Pêşmergeyên Eniya Kurdistanî, li ber avahiya parlamento gulle reşandin ser meşvanan û 3 kes kuştin.

Ev meşa ku li Kurdistana Başûr çêbû, ji bo Kurdên Kurdistana Bakur a yekemîn bû. 30'yê Tebaxê, danê nîvro, 500 kes ji dilxwazên PKK û PAK ê, bi dirûşmeyên li dijî Komara Tirkiyê, dest bi meşê kirin. Meşvan gava gihîştin avahiya parlamentoyê pêşmerge jî gulle reşandin ser meşvanan û sê kes kuştin.

Ji vê bûyerê bi 3 roj şûn de Berzanî û Telabanî bi serokwezîrê Komara Tirkiyê Demirel re, civînek çê kirin. Ev tişt bala mirovan pirr dikşîne. Bila li bajarên Kurdan bi destê dewleta Tirk qetlîam çêbibin û piştî li Kurdistana Başûr, ên ji xwe re dibêjin em hikûmeta Kurdan e, nehêlin ku gel, li dijî qetlîamê bimeşin û pişt re jî bila herin bi berpirsiyarê qetlîama Şirnexê re civîn çêkin. Ev bûyer di demek wisa de çêbû ku, serokên Eniya Kurdistanî û berpirsiyarên dewleta Tirk, di amadekariya operasyonek hevbeş de bûn. Ji ber vê jî, ev bûyer ne tiştek ecêb e. Armanca wan tunekirina têkoşîna Kurdistana Bakur e. Ji ber vê jî, dixwazin PKK'ê ji bargehên Başûr derînin. Belê, wê ev şirîkatiya wan a xiyanetê, bi dilsozî û bi têkoşîna Bakur û Başûr vala derkeve.

## Şirnex û bêdengiya dinyayê

Şirnex hê jî, bajarekî vala ye. Ji xeynî berpirsiyarên dewletê, tîm, polîs, leşker, cerdevan û çend malbatên din, tu kes tê de nîn e. Gelê Şirnexê, li hêla çiyayê Cûdî protestoyên xwe bêdeng û ji bala dinyayê dûr didomînin. Bêdengiya welatê Ewrûpî, hin pirsan derdixe holê. Gelo, Tirkiye vê qirkirinê bi raya van welatan kir? Gelo ev şampiyonên demokrasiyê li gor programekî, ji Tirkiyê re çavên xwe digirin? Belê, pirs gelek in. Bi rastî jî, tu pirs bê bersiv nîn in. Lewra demokratbûna van welatên imperyalîst, heta ber taxa berjewendiyên wan e. Ji wir û pê ve, ne demokratbûn, ne jî mirovparezî dimîne.

Belê gelê Kurd, raya giştî ya Tirkiyê, komele û saziyên demokrat û HEP, ji bo alîkariya Şirnexiyan, bi kampanya û protestoyan, piştgiriya xwe nîşan dan û wan bi tenê nehiştin.

### KAMPANYAYÊN ALÎKARİYÊ

Serokê Belediya Cizîrê Haşim Haşimî, ji bo qût û derman, pêşengiya kampanyayekê dike. Haşim Haşimî, bang li hemû dinyayê dike, da ku alîkariyê bigihînin gelê Şirnexê. Partiya Keda Gel (HEP) jî, dest bi kampanyayek giştî kir. Ev kampanya, li bajarên Kurdistanê û li metropolên Tirkiyê didome. Belê, dewletê cardin rûyê xwe yê hov eşkere kir. Li Edenê, bi pêşengiya rêxistina HEP navçeya Yüreğir, bi destûra qeymeqam kampanyayek vebû. Endamên HEP'ê, li Edenê jî, buro ava kiribûn, da ku alîkarî bicivînin. Lê polîs bi fermana Walî, avêt ser van buroyên alîkariyê û dest danî ser alîkariyên ku xelkê kiribû. Ji bilî van kampanyayan gelê li bajar, navçe û gundên Kurdistanê, piştgiriya Şirnexiyan dikin û alîkariyan dicivînin.

### PROTESTO Û LİVBAZÎ

Li gelek bajarên Kurdistanê û li metropolên Tirkiyê, ji bo protestokirina bûyera Şirnexê, livbazî li dar ketin. Xortên şoreşger, bi meş û êrîşan, bankayan bi molotofan şewitandin, li Stenbolê keştiyek (gemî) jî hate şewitandin. Di meşan de, bi dehan xort û keçên Kurd û Tirk hatin girtin.

Nûnerên saziyên Demokratîk û çend rewşenbîr, ji nav xwe heyetek bijartin û ev heyet, li herêmê geştek li dar xistin. Ev heyet ji 27 kesan ava bûbû.

Gelek saziyên demokratîk û sendîka jî, piştgiriya xwe, ji gelê Şirnexêre nîşan dan.

Li gelek bajarên Ewrûpa jî, livbaziyên girseyî çêbûn. Li çend bajarên Ewrûpa meş li dar ketin, gelek avahiyên civaka Ewrûpa, hatin îşxalkirin û dengê Kurdên wan deran bi hewara Şirnexiyan re bû yek.

Girtiyên zîndanan jî, vê bûyerê protesto kirin û piştgiriya xwe bi grevên birçîbûnê nîşan dan. Niha di gelek zîndanan de, grevên birçîbûnê didomin.

## A. Sıddık Turhallı hat qetilkirin

A. Sıddık Turhallı di roja 30.8.1992 an de, saet di 21.00 an de, li Diyarbekir, li taxa Ofîsê ji paş ve hate qetilkirin.

A. Sıddık Turhallı kekê Hüseyin Turhallı yê serokê Partiya Keda Gel (HEP), ê Diyarbekirê bû. A. Sıddık Turhallı heta kuştina xwe îmamtiya camiya Beraatê dikir û carek hatibû girtin. Lê sebebê girtina wî ne hatibû kifşkirin. A. Sıddık Turhallı bavê heşt zarokan bû.

Li ser qetilkirina A. Sıddık Turhallı daxuyaniyên ku hatin kirin, gelek niqtên tarî derdixin meydanê. Li gorî daxuyaniyan haya polisan ji qetilkirina Turhallı hebûye. Lawê Turhallı dibêje: "Ku; haya polisan tunebûya çawa piştî qetilkirina bavê min di eynî gavê de 300-400 polis dikarin li hev bicivin. Ev yek, dide nişan ku haya wan ji vê yekê hebû."

Dotira rojê du hezar kes darbesta A. Sıddık Turhallı dan ser milên xwe û bin ax kirin.

# PÊNÛS



Amed Tîgrîs

## Lumpenên nîjadperest

Bi wesîta satalîtan (peyk-uydu) Tirk li Ewrûpa çend kanalên TV ê bi kar tînin. Ji wan kanalên Tirkî yek navê wê **Interstar** û ya din jî **Teleon** e. Programên herdu kanalan jî, bi kumar, reklam, bêedebî û bêkulturî dagirtî ne. Ji aliyê nûçeyan ve jî, ev herdu kanal wek dengê polîs û leşkerên Tirk in. Xwedêgiravî ev herdu jî, li Ewrûpa ne û xwe Ewrûpî dihesibînin. Di van herdu kanalên taybetî de, herroj piştî nûçeyên 18.30'an, bi navên **Engin Ardıç** û **Meriç Köyatası** du şîrovevan (komentator) hene. Çawa Interstar û Teleon wek kopyayên hevdu ne, an jî yek siya ya din e, herwiha Engin Ardıç û Meriç Koyatasi jî, kopiyayên hevdu, an jî siya hevdu ne. Herdu ji herroj wek berdevkên Sakıp Sabancı an jî Eczacıbaşı şîroveyan dikin. Carnan jî wek serokleşker û serokpolîsên Tirkiyê qise dikin.

Piştî bûyera Şirnexê herduyan jî êdî xwe winda kirine. Wekî kûçikê har, gilêz ji devên wan diherikin. Raste rast çêrê (kufurê) Kurdan dikin. Çêrên ronakbîrên Tirk dikin, ên ku alîkarê Kurdan in. Mesela Engin Ardıç hefteya borî di Interstarê de wiha digot:

***Kolonyalîstên Ewrûpî dema welatê din îşgal dikir, lê, hebûn, ziman edebiyat û kultura wan qedexe nedikir. Hûn ji ber vê yekê jî, ji kolonyalîstên din cuda ne. Hûn Kemalîst in. Kemalîst kolonyalîstên nîjadperest in.***

"Mehdi Zana Efendî, yanî mêrê Leyla Xanimê dibêje ku li Tirkiyê du xelk hene. Tirk û Kurd. Bila Tirk herin ser axa xwe û Kurd jî herin ser axa xwe. Şoşşş... Hîtler jî wekî Mehdi Efendî negotiye. PKK dibêje ez dê Kurdistaneke serbixwe ava bikim. Şoşşş... Di nav wê de Ezîrgan û Qers jî hene. Şoşşş... Niha çav berdan Mersîn û İskenderûnê jî... şoşş... Serserî pêzewengino! Carek Kurd nikarin dewlet çêbikin. Hemû cahîl û paşvemayî ne. Carekê ez bi parlementerekê wan re çûm Ewrûpa, wî li dikanê plakê dît, nedizanibû ew çi ye. Heger parlamenterê wan hê plakê nas neke, ew dê çawa dewlet çêbikin.

Apo dê dewleta sosyalîst çêbike. Wê gavê mafiya qedexe dibe. Lê niha mafiya Kurdan li Stenbolê ye û dewlemend in. Kurd hatin metropolê, dewlemend bûn. Mal û milkên wan li van deran gelek in. Heger Kurdistan çêbe, ma dê kî bihêle ku ew mal û milkên xwe ji vir bibin Kurdistanê. Lihêfa bigirin û siktirê Şirnexê bibin. Hem welatê me perçe bikin û hem jî sermaye û malê xwe bigirin û bibine wê derê... şoşşş..."

Ev ne gotin û dîtinên te yên serbixwe ne Engin Ardıç! Ên kolonyalîstan in. Li Asiya û Afrîkayê her dema ku gelên bindest li dij kolonyalîstan dest bi şerê serxwebûnê kirin û heta îro kolonyalîstan digot: "Ev xelkên paşvemayî ne. Nikarin xwe îdare bikin. Bê kultur in. Feqîr in. Bi rastî em ji wan re alîkariyê dikin...

Lê, yê we ji bo hûn xwe Ewrûpayî û medenî dihesibînin, ji wan kolonyalîstan bêtir hinek taybetiyên we yên din jî hene. Ev jî taybetiyên Kemalîzmê ne ku înkarkirina gelê Kurd e. Qedexekirina ziman, edebiyat û kultura gelê Kurd e. Kolonyalîstên Ewrûpî dema welatê din îşgal dikir, lê, hebûn, ziman edebiyat û kultura wan qedexe nedikir. Hûn ji ber vê yekê jî, ji kolonyalîstên din cuda ne. Hûn Kemalîst in. Kemalîst kolonyalîstên nîjadperest in.

Bi kinc lixwekirin, krawat girêdan, an jî wek Ewrûpiyan porê xwe zerkirinê hûn nabin Ewrûpî û mirov. Ew parlamenterê ku tu behsa wî û nezaniya wî dikî, dibe ku hevalê te Hikmet Çetin an jî Mehmet Kahramanê xwefiroş bin. Ma ku ew ewqas nezanin û nizanin plak çi ye, we çima yek kiriye Wezîrê Derve û yê din jî kiriye Wezîrê Dewletê û Mafê Mirovan û ma ew, dewleta we di platformên internasyonal de temsîl nakin? Lê îro li Ewrûpa rastiyekê heye ku her kes û dewlet pê dizanin; Tirk wek civatek ku Ewrûpa bûne sembola nezanî û barbariyê. Kurd wek civatek ku gelek ji wan pêşvetir in. Di vî warî de statîstîk jî hene.

# Giya û kulîlkên Kurdistanê

Huseyîn Denîz

Li çol û çiya, deşt û newalên welatê me gelek şiklên gîha û kulîlkan hene. Hin giya hene, tên xwarin, hin jî hene nayên xwar in. Giyayên şêrîn hene, ê tal hene, ê jehrî hene. Gelek şiklên giya û kulîlkan, ji hezar salan vir de, ji xelkê me re derman in.


Li welatê me renge reng kulîlk hene. Kulîlkên sor hene, kulîlkên zer hene, kulîlkên kesk hene, şîn hene, sipî... hene. Di zimanê me de jî gelek navên şiklên giya û kulîlkan hene. Li welatê me, mirov nikare ji pirrbûna kulîlkan bimeşe.

Welatê bê xwedî, xwedîtiyê li giya û kulîlkên xwe jî nekiriye. Jixwe ku welat bê xwedî be, wê her tişt bêxwedî bimînin. Ji ber vê bêxwedîbûnê, îro gelek navên kulîlk û şiklên giya ji bîr bûne. Xasma kesên ciwan ne kulîlkên welêt û giyayên welêt nas dikin û ne jî navên wan zanin.

Ji niha pê ve ne bila kulîlkên me winda bibin û ne jî navên wan. Emê berê navên giya û kulîlkên welatê xwe tesbît bikin, binivîsînin.

Di demek fireh de emê li gora navên wan, van giya û kulîlkên xweşik bidin naskirin. Ev xebata me ya biçûk bila bibe rêşan ji hevalên ku bixwazin di vî warî de xebatê bikin.

Me li jor jî got; li welatê me bi hezaran giya û kulîlk hene. Li her herêmên (bölge, kesim) welêt navên guhertî hene. Yanî li her deverê, navan li kulîlk û giyayên me dikin. Em dixwazin bîrbirên welatê me, şiyar û hevalên me, herkes ji aliyê xwe ve navên giya û kulîlkan bidin hev, bicivînin. Ku bi çend rêza wan bidin naskirin, wê hin çêtir bibe.



*Kulîlkeke Kurdistanê ji pirtûka Mihotulî*

Ezê di vê nivîsê de navê hinek şiklê giya û kulîlkan binivîsînim. Di nivîsek xwe ya din de jî ezê navê heywanan, kêzikan, mêşan û çûkan (çivîkan) binivîsînim.

Niha navên çend şiklên giya û kulîlkan:

Axbendir, baqil, baqilê gê, baqilê kewa, baqilê pez, baqilê mêr (mar), baqilê xatûnkê, baqilê kera, batof, benc, beng, bilbizêq, benav, boqênêrî, botav, cehter, ceh, ceft, berû, cehdasik, dargerînk, derpîkê pîrê, dirîreşk, dîbê, dûberan, fisagur, fîqeroşk, kereng, pîvok, tolik, gapeçêl, gangilok, gebka minê, gezgezk, gezer , hermel, heshesûk, hilbê, indeko, incas, îskê kera, jehrî, kardî, karûş, kelbeş, kenêr, kerxenîq, kezberan, laflafk, giya nermik, giya şêrînk, giyakê sêvê, giyakê wehşa, giyabo, guhîj, gul, gula berbiro, gunkavirk, harik, hîro, kizin, gilgil, garis,qamir (qarim), kulîlk, kulîlka Nîsanê, kulîlka şevê, kulîlka hespa, mijmijok, mizeloq, nefel, nikla dîk, nîsk, genim, nok, nokreş, perpar, xernûb, xernûbê kera, gijnîj, kundir, şimamok, petêx, petrîşok, pûng, pozxwark, qîvar, qîvarê gê, qîvara pez, qîvarê reş, qinêber, qurîncek, reşik, rexdik, serbimast, sersipîk, sêdirank, silk, tivir, simaq, sîr, sîrdim, sorsork, sosin, nêrgiz, şamik, bacanê sor, bacanê reş, şaqithilo, şembelirk, şelim, şinekş, şolik, talaşêr, talî, talik, teraqî, tihû, tirozî, xitî, xiyar, xertel, xuşîl, tûzmask, xelendor, tirîkê pîrê, xes xezrovîk, xişxişok, xos, xîs, xurêl, nîskê kera, ajik, belalûk, xîlok, qirqaş, zengilzava.

# Çend têgînên çewt

Mamo Cûmî

Di zimanê kurdî de wekî hemû zimanên dinê, carna gotinên çewt tê de çêdibin. Di vê gotarê de, em dikin li ser hin têgînên şaş rawestin û nêrîna xwe ji xwendevanan re diyar bi kin.

**1)** Rêveberiya taybetî: Ev gotin ji zaravayê kurmanciya jêrîn bi çewtî derbasî zaravayê kurmanciya jorîn bûye.

Be + rê + we + birdin: Bi rê ve birin. Gotina rast "**Birêvebirin** an rêvebirina taybetî" ye.

**2)** Îroyî, an îroyîn: pêşpirtika (î) di Avista de (itha = vir) ye. Ev pêşpirtika him acêktîfa him advêrban çê dike. Bo nimûne: îsal, Newroza îsal; îro, roja îro; îcar, cara îcar; îşev, şeva îşev û hwd... Gava pêşpirtika (î) hebe, pêdiviya paşpirtika (î, în) nîne.

**3)** Hingûr: Celadet Bedirxan wisa şîrove kiriye: Piştî êvarê, destpêka şevê (Şeva tarî ji hingûrê kifş e). Ravekirina Apê Osman, bi nêrîna me, rasttir e: "Hingûr" bi kurdî "şefeq, berbang" e. "Hing" mêşhunguv e; "ûr" wexta ku mêşhunguv radibe. Mêşhunguv di şefeqê de radibe xebatê. Piştî ku Kurd bûne Misilman, rabûne "şefeq" ji Ereban standine (wergirtine) .

**4)** Pirr kes berî (ku) bêhnokekê (,) datînin, (ku) bi xwe du hevokan bi hev dixîne. Çewt e eger mirov herdu hevokan bi bêhnokê ji hev veqetîne. Bo nimûne: Ez dixwazim ku tu biçî welêt; Tu dikî ku ew bikeve xebatê. Mirov dikare bihnokê bixe piştî (ku). Bo nimûne: ez hez dikim ku, bi şev, tu tenê neçî deştê.

**5)** Hozan û hozanvan: Kurdên Başûr "hozan" bi wata "helbest" û "hozanvan" bi wata "helbestvan" bi kar anîne. Ev çewt e. Du paşpirtik (zan + van) li pey hev nabin. "Hozan" kesê "zana" ye.

**6)** Karanîna Enfînîtîfan (mastar, rader) bi pişkên dinê re nayên guhertin. Bo nimûne.

Çewt - danqebûlkirinê

Rast - dan qebûlkirin

Çewt - hatkişandinê

Rast - hat kişandin

**7)** Karanîna çewt a êzafê (pirtûka nasandinê):

Çewt

-Yekîtiya Rewşenbîrên welatparêzên Kurdistanê

Rast

-Yekîtiya Rewşenbîrên welatparêz ên Kurdistanê

**8)** Di gel rêz û silavan: Kurdên Başûr ev gotina hanê ji Ereban girtine. Ereban jî, ji gotina Îngilîzan "with respect" birine. Wergerandin ji wergerandinê bi carekê çewt derdikeve. Divê mirov bi kurdî birame. Mirov dikare bibêje: silavên min ji te re hene; silavên min li te bin, û hwd...

# Koma Berxwedan: "Meşa Azadî"

Muzîk jî, navgînek têkoşînê ye, ku qenc bê bi kar anîn. Bi taybetî jî, di dema têkoşîna neteweyî û civakî de. Muzîk, ji bo gelên ku bindest in û zêde xwendin û nivisandina wan tune ye re, çekek bê hempa ye.

Koma Berxwedan bi vî rengî, di binê siya Hunerkomê de hat damezirandin. Kom, heta niha gelek qaset derxistiye. Gelek kesên me bi saya xebatên muzîkê û bi saya qasetan, bi hişê xwe ve hatine. Xwe nas kirine. Kom bi qaseta Meşa Azadî rengek nû dihîne muzîka Kurdî.

Em dikarin bibêjin ku Koma Berxwedan hetanî niha tu qasetek wiha, ku bi hunerî û xurt hatibe çêkirin, çênekiriye. Divê mirov di vir de beşdariyên muzîsyen Îqbal Hîcabî, ji bîr neke. Bi rastî jî, piştî beşdarbûna Îqbal Hîcabî, Hunerkom di warê muzîkê de bi peş ket.

Koma Berxwedan bi alikariya Îqbal Hicabî, di vê qaseta xwe ya Meşa Azadî de, gelek tiştên nû bi kar anîne. Guhertinên mezin di mûzîka kurdî de çêkirine. Hem pirredengiyê û hem jî orkestrasyonê di qasetê de pêk anîne. Qaset hema bibêje ku qet ji muzîka kurdî dûr neketiye. Di qasetê de gelek enstrûmant (alet) ên Ewrûpî hatine bikar anin, disa jî , ji bêhna muzîka kurdî tiştek kêm nebûye.

Herkes dikarê vê qasetê gohdarî bike, perwerda wî çi dibe bila bibe. Lewra nûjenkirin ji binyata mûzîka kurdî tu tiştek xera nekiriye

Perçên ku di qasetê de hene em dixwazin bidin nasîn. Hinek perçê gotin û muzîka wan gelêrî ne û hinek jî xweber in.




*Berga (kapaxa) Meşa Azadî*

**Di beşa A'yê de**

1. Kew Hêlînê
2. Desmalê
3. Cîranê
4. De Bihejîne
5. Sersala PKK
6. Qasimo (lawik)
7. Lemilanîm ke

**Di beşa B'yê de jî**

1. Meşa Azadî
2. Kurdistan
3. Lerzanê
4. Piroz Be
5. Şirînew Sewze
6. Serxwebûn
7. Pêşmerge

# Folklora Botan 15- Stiranên olî (dînî)

**Beşîr Botanî**

Xwendewarên hêja û xweştivî

Vê carê ez ji we re kada (behsa) stiranên olî dikim û heger kêmasî jî hebin, hema ji çakiya xwe li kêmasiyên min nenêrin. Ji ber ku ez bi xwe ne oldar im û olê jî baş nanasim. Lê stiranên olî baş dizanim û li gor karîna xwe pêşkêşî we bikim.

Hevalan! Weke tête zanîn li Kurdistanê çar ol hene û morgên (stîlên) wan cuda ne û carna weke hev in, yan nêzîkî hev in û hwd...

**A. Ola Zerdeştî Êzîdî (Hirmiz 19 salî)**

**1. (Yezdan yek e)**

Yezdan yek e, na xivê
Abedîn e, zana û xurt e
Her hebû, her heye û her dê hebê
Ji afirandiyê xwe re mihrivan e.
Çakî û xweşiya wan dixwazê..
û heya dûmahiyê...

**2. Pêxember Eyûb (ji devê Baranî, 81 salî)**

Pêxembera bînin
Hemî welya bicivînin
Sebrek weka sebra Eyûbî nabînin

Eyûb sebrê gişte
Kirma xwarbû tenişt e
Eyûbî şikrînî ji navê Xudê dixweste

Eyûb sebrê hinde
Kirma xwaribû zend e
Eyûbî Şikrînî ji navê Xudê dixwende

Eyûbî çar tişt man
Ji bo xwendinê ziman
Çav ji bo dîtinê, hiş û dil bo îman

Eyûb sebrê çê wo
Kirma xwaribû pê wo

Ewyûb sebrê baş e
Kirma xwaribû laş e

Eyûbê, sebrê kok
Kirman xwaribû çok e

Eyûb serbrê hana
Kirman xwaribû rana

Eyûb sebr li nik e
Kirman xwaribû zik e

Eyûb sebrê her e
Kirma xwaribû ser e

Kirmê Eyûbî zer
Digeritin seranser

Kirmê Eyûbî sor
Digeritin dormandor

Kirmê Eyûbî reş
Digeritin ferş bi ferş

Kirme Eyûbî spî
Gehişte serê dilî
Bi şiyana Yezdan
Cibraîl anî derman
Pê laşê Eyûbî çêtir kir heft caran

Eman hole hola
Laşê Eyûbî pola
Eyûbî loha xwe biribû ser hola

**B. Ola Mûsayî (cihûyî) ji devê Mordixay Izra nêzîkî 70 salî**

**1. (Behişt)**

Xudê cihekî xweş didê te
Li newal û çiyayên wî cihî
Gelek in cok û kûrav û kehnî

Cihekî bi darên hêjîr û tirî
Cihekî bi genim e û bi ceh e
Bi hingivîn e û bi darên zêtûnê

Cihekî li wê derê
Bi hejarî xwarinê na xwî
Li wê derê her nîne kêmahî

Li kevrên wî cihî maden hene
Li wê derê dê bixwî û têr bibî
Dê razî bî. û ha j' xwe hebe
ku xudê ji bîr ne kî
Amîn!

**2. Ho deye (zimanê îbranî)**

Uhîl yom yom işteê
Temîd ênî tsofiye
Êevra na vêêrê
Edmat kodêş Tvêrye

Ho deye deye deye
Deye lê sara deye
Ho deye deye deye
Edmat kodêş Tvêrye

Niêîme ye şîvete
Vî gam tove riîete
Yam kinêrit hunete
Şame haîr binwiye

Ho deye deye deye
Deye lê sara deye
Ho deye deye deye
Edmat kodêş Tvêrye

**C. Ola Îsayî (Filehî)**

**1. Lavijek (ji kasêtek)**

Lo, ev çi deng e û ev çi heydan e
Û ev çi gurgur e li asman e
Dengê Nefîr û Zirna û Borîzan e
Hin dibêjin qiyamet e û hin dibêjin axirzeman e

Lo, dengê Sitr û Boq û Nefîr ji amama hatiye
Erd û asman hejiyan deng kete guhê miriya
Û rih ketin bedena û xunava qiyametê bi ser wa bariye
Û hêşîn bûne weke geyayê e ku bihar lê hatiye
û hwd...

**2. Pişkeka (beşeka) kurt ji nivêjek ji kasêtek**

Ho babê me li asmana
Bila navê te pîroz bê
Bila xundikariya te bê
Bila vîna te li erd û asmana bête bi cihanîn
Îro nanê me yê rojê bide me.
Amîn

3. "Ya sitar, ya gelî birano, wextê melekê mewtê nazil dibê li ser rihê mirov çi qa zehmet e, ji tirsa hiş û bîr di serê mirov de namînê.

Wextê sikarê mewtê hingî ku ji însan bihatana wê bazdabana û ne disekinî. Lê werselê laşê wî têne şikandin bi yek derbî, milyaket dişkîne. Lo mirî dibêjî weqatê milyaket rihê standiye ez bimrim ez girêdam bi colê de li şehristanan li berî û beristanan li bajarê wa deran ku ez çûme ji roja ku Xudê 'ez dame vê dinyayê heta îro..." û heya dûmahîkê
Amîn

Ev gotinên ha ji berhevokek min deranîne,
Ya ku bi dest hatibû nivîsandin.

Xwendevarên rêzdar! (Muhterem)

Li dûmahiyê, ez nivîsara xwe bi Qurana pîroz hew dikim û hêvîdar im ku hûn ji gotinên Xudê bêzar (êciz) ne bin dema ku dibêjit:

"Înna enzelna lekum Quranen erebiyen leêlekum tetqilûn."

Anku "Me Quraneka erebî ji we re şandiye da hûn aqil bibin."

Amîn

*Rûpelek ji dîroka Kurdistanê: Xoybûn (2)*

# Serhildana Agirî

**Ev serhildan ji şoreşa Şêx Seîd ne firehtir bû, lê belê, ji alî gihabûna wê ya siyasî û armanca wê ya dawî, ya xuya û eşkere, çêkirina komareke kurdî ya serbixwe bû. Ji ber van tiştan, cihekî bilind li gor tevgerên berê digire.**

**Kamîran Haco**

Serhildana Agirî bi serokatiya Îhsan Nûrî Paşa dest pê kir. Di sala 1927 an de berî wê Xoybûn hatibû damezirandin û xwestin ku alîkariyê bi vê serhildanê re bikin û têkiliyên xwe pê re çêkin.

Di bîranînên Îhsan Nurî Paşa de tê gotin: "Çaxê ku şer li Agirî dibû, di wî wextî de li cihekî dûr, kongrekî neteweyî pêk hatibû û komîta Xoybûn hat damezirandin û Îhsan Nurî hate hilbijartin û bû serokê gelemperî yê hêzên çekdar û karê şer bi wî ve hate girêdan." (8)

Q. Cemîl Paşa dibêje: "Çaxê ku Xoybûn pê hisiya Îhsan Nurî Paşa li Araratê ye, rabû ew kire nûnerê xwe û serokê leşkerî yê Xoybûn û serekê hêzên welatparêz yê Araratê, dû re Îhsan Nurî têkiliyên xwe bi navendê (merkez) re xurt kirin û rojnameyek bi navê "Agirî" li wir derxist, tê de gelek gotarên giring li ser pirsa neteweyî hebûn.." (9)

Tê xuyakirin ku Xoybûn û serhildana Araratê li hev rast hatin, di demek ku herdu li alîkariya hevbûn, ji alîkî ve, serhildan li çarçoveke konevanî digeriya û ji alîkî din ve, Xoybûn li beşekî leşkerî ji rêxistina xwe re digeriya. Lewra herduyan jî bê dudilî hev û du qebûl kirin.

**RÊBERÊ SERHILDANA AGIRÎ**

Xoybûn bû rêberê serhildana Araratê û tesîra wê hate xuyakirin, ta radeyek (derecekê) ku sembola Xoybûn bû nîşana leşker û zabitên serhildanê "nîşanên leşkeran sembola (îşareta) Agirî yê mezin û biçûk bû, li ser kumên xwe datanîn, ew jî li ser kevirekî biçûk hatibû kolan û zabitan sembola Xoybûn datanîn û nîşanên wan li ser milên wan bûn. Sembola Xoybûnê jî, xencerek di nav du sinbilan de bû û li hember, pirtûkek bû, her sê tişt bi hev re girêdayî bûn û roj raserî wan bû, tîrêjên xwe davête ser hemûyan." (10)

Û nivîsandinên ku di navbera navend (merkez) û beşan de dihate belavkirin, sembola Xoybûn li ser hebû û bi navê merkeza Serokatiya Agirî dihate muhirkirin, yanî dan û stendin hatibû tenzîmkirin "çaxê ku nivîsandinek hatibane şandin, li jore, li aliyê rastê dihate nivîsandin (Xoybûn) û di binî de (meclîsa neteweyîya kurdî) û li aliyê çepê, li jor, dihate nivîsandin (Agirî merkeza serokatiyê).. " (11)

Diyar bû ku Xoybûn bi her awayî alîkariya serhildana Agirî dikir û jiyana xwe bi domandina serhildanê ve girê dabûn û hêviyên wan ji bi vê yekê xurt bû ku serhildan wê bigihîje armanca xwe...

Di Hezîrana 1930 an de, leşkerên Tirk êrîşeke xurt û dijwar birine ser Agirî û xuya bû ku armanca wan qirkirina Kurdan e û binxistina serhildanê ye... ji bo vê yekê: "Xoybûn têdigihe ku serhildaneke gelemperî li Kurdistanê ne mumkun e, ji ber rewşa welat, û ji ber ku rêxistineke ku pêşewariya vî tiştî bike nîne... lê eger êrîşa Tirkan bi ser keve, wê îdara Araratê ya ku bûye rabûna Kurdan a neteweyî, bişkîne û ji bo ku armancên Tirkan pêk neyin, Xoybûn biryar dide, ji bo êrîşeke ji başûr ber bi alî bakur ve, di şeva duşemê 3/4 Tebaxa 1930 an de bike" (12)

1 Ekrem û Qedrî Cemîl Paşa: wê êrîş bikin ji aliyê Mêrdînê ve

2 Bozan Beg: wê êrîş bike, ji aliyê Kûbanê ve.

3 Mehmûd Beg Îbrahîm Paşa yê millî: wê êrîş bike ji aliyê Serêkaniyê ve

4 Mîr Celadet û Haco Axa: wê êrîş bikin ji aliyê eşîra Hevêrka (çiyayê Bagokê).

Ji ber gelek sedeman, êrîşa ji başûr, ji alî van kesan ve, tu netîce neda, ve hinek ji wan derbas bûn û ên derbas bûn jî, eşîrên Kurdan ketine pêsîra wan, ji neçarî ew jî vegeriyan, di pey vêr tevgera han de, endamên Xoybûnê hatin surgûnkirin, ji alî Fransizan û ew birine Şamê...

Mixabin ku serhildana Araratê, weke gelek serhildanên Kurdan, têk çû û bi alîkariya Îranê û Sovêtîstanê, Tirkan serhildanê vemirand. Îhsan Nurî Paşa dibêje: "Şoreşgerên Agirî gihane baweriyekê ku berxwedana li dijî van hêzên bêjimar û ji ber haziriya dewletên Sovyetî û Îranî, ji bo alîkariya dewleta Tirkî, ji bo hêrivandina şoreşê, ev berxwedan bê sûde (fêde) ye.." (13)

Bi hêrivandina serhildanê û surgûnkirina endamên Xoybûnê derbeke dijwar li tevger û rêxistinê ket.

Lê belê: "Serhildana Araratê diyar kir ku gihabûna Kurdan a konevanî (siyasî) û zanebûna wan bilind bû, ji ber ku ev serhildan ji şoreşa Şêx Seîd ne firehtir bû, lê belê, ji alî gihabûna wê ya siyasî û armanca wê ya dawî, ya xuya û eşkere, çêkirina komareke kurdî ya serbixwe bû. Ji ber van tiştan, cihekî bilind li gor tevgerên berê digire, ev serhildan di Araratê de pêşve çû, di bin ala Kurdistaneke serbixwe de û Xoybûn pêşewariya wê dikir ji alî siyasî û leşkerî (eskerî) ve. Di vê rêxistinê de rewşenbîrên kurd û burjûwaziya bazirganî û feodalên welatparêz hebûn û tiştên ku ev hemû digihande hev û dikirin yek, kîna wan li dijî dewleta Tirkî, nîjadperest ku siyaseteke hovane bi kar tanî, û mafê gelên din, yên di Tirkiyê de, winda kiribû..." (14)



*Serokê Serhildana Agirî Îhsan Nuri Paşa û xanima wî*

**XEBATÊN ÇANDÎ**

Xoybûn ma, ta dawiya salên pinciyan (1950) di vê navê de karên wê bêtir kete li ser pêşxistina ziman û zanebûnê. Nemaze Mîr Celadet ê ku xebateke pirr hêja û bi rûmet ji bo ziman û kultura kurdî kiriye û xebata wanê siyasî û belavkirina romanên neteweyî ji alî wan, bê sûde neçû û rêxistinên neteweyî bi rengekî pêşketîtir di dawiya salên pênciyan de çêbûn.

**Çavkanî:**


**8** : Çapa Erebî ji pirtûka bi navê, Bîranînên General Îhsan Nurî rûpel 29, Bêrût, Temmuz 1990

**9** : Doza Kurdistan, rûpel 134135, Beyrût 1987

**10** : Bîranînên Îhsan Nurî Paşa, rûpel 5354

**11** : Jêderê berê, rûpel 87

**12** : Doza Kurdistan, rûpel 153

**13** : Bîranînên Îhsan Nurî Paşa, rûpel 104.

**14** : Celîlê Celîl (Tevgera Kurdî Di...) rûpel 169

# Ziya Gökalp û Tirkbûna Diyarbekir

**Ziya Gökalp, Kurdiya ku li Diyarbekir tê peyivîn, kurdiyek teng û ji ber xwe çêkirî (düzme) nîşan dide. Ma gelo ji tirkî zêdetir zimanek ji ber xwe çêkirî heye? Ev Tirkiya ku îro di zanîngehan de pê tê xwendin û nivîsîn, hindiktirîn ji sedan pênciyê wê, ji alî sazgehên zimanê tirkî ve hatiye çêkirin.**

M. Merwanî

(2)

Ziya Gökalp wiha didomîne: "Diyarbekiriyan hemû qaîdên rêzimaniya kurdî rakirine, peyvrêzî (sentaks, söz dizimi) ya kurdî li gor gramera tirkî bi kar anîne û kurdiyek sunî afirandine. Em ji vê kurdiyê re "Kurdiya Tirkan (Türk Kürtçesi) bêjin dê gelek rast bibe. Ev niqta ku di mijara ziman de gelek girîng e, di Tirkbûna Diyarbekiriyan de jî, delîlê herî mezin e. Ji bilî vê, Diyarbekirî gava ku bi Kurdan re dipeyivin, vî zimanî bi kar tînin. Ew di nav xwe de bi tenê bi tirkî dipeyivin. Em bên ser vê Kurdiya "ji ber xwe çêkirî (düzme, uyduruk)" ya ku ji xwe tenê Diyarbekirî pê dizanin, ew jî gelek teng e. Ji ber vê sedemê valahiyên wê bi tirkî tên tijekirin. Ji xwe Kurdiya ku pirrên wan dizanin jî, bi tenê çend peyvên wekî "here, were" ne.

Berî her tiştî ne bi tenê Diyarbekirî, hemû Kurd gava ku zimanekî biyanî hîn dibin, qaîdên gramera zimanê kurdî di wî zimanî de bi kar tînin. Ev ji bo gelên din jî wiha ye. Herwekî tê zanîn zimanî kurdî û tirkî ji hev gelek dûr in. Du niqteyên girîng ên ku zimanê kurdî ji tirkî diqetînin jî, zayend û tewang in. Kurdî zimanekî tewangbar e; navên kurdî tên tewandin. Dîsa hemû peyvên kurdî an mê an jî nêr in. Lê di tirkî de tiştekî wiha tune. Bo nimûne; li Diyarbekir yekî ku teze bi tirkî hîn bibe, dikare pirseke wiha bike:

Sen Delalê'yî görüyor musun? (Tu delalê dibînî?)

Di vê hevokê de "ê" tewanga navê mê ya yekhejmar e. Di gel ku ev qaîde di tirkî de tune, Kurd bi hêsanî hevokên wiha bi kar tînin. Dîsa pirr caran ew Kurdên ku bi zora asîmîlasyonê tirkî hîn dibin, zayendê di zimanê tirkî de bi kar tînin.

**Wekî:** Arkadaşê min (ji bo nêr, ango hevalê min)

Arkadaşa min (ji bo mê, ango hevala min)

Di van hevokan de "ê" zayenda navê nêr a yekhejmar e; "a" jî zayenda navê mê ya yekhejmar e. Ev qaîde rasterast qaîdên rêzimana kurdî ne û di tirkî de tên bikaranîn. Ziya Gökalp ji bo wê kurdiya ku li Diyarbekir tê peyivîn, dibêje "Kurdiya Tirkan"; lê wî ji min çêtir dizanibû Tirkiya ku li Diyarbekir û li Kurdistanê tê bi kar anîn "Tirkiya Kurdan" e. Lewra di vê Tirkiyê de pirr caran, bi awakî çewtî be jî tewang heye, zayend heye û hevok li gor gramera kurdî tên sazkirin. Ev tirkî rasterast "Tirkiya Kurdan" e.

Ziya Gökalp rastiyan vedişêre û berevajiya tiştan dibêje. Ew dibêje "Diyarbekirî gava ku bi Kurdan re dipeyivin vî zimanî bi kar tînin; di nav xwe de bi tirkî dipeyivin." Di dema Ziya Gökalp de (û niha jî) Diyarbekiriyan bi hev re bi kurdî dipeyivîn. Piştî asîmîlasyona 70 salan jî dîsa îro Diyarbekirî bi hev re bi kurdî dipeyivin.

Ziya Gökalp kurdiya ku li Diyarbekir tê peyivîn, kurdiyek teng û ji ber xwe çêkirî (düzme) nîşan dide. Ma gelo ji tirkî zêdetir zimanek ji ber xwe çêkirî heye? Ev tirkiya ku îro di zanîngehan de pê tê xwendin û nivîsîn, hindiktirîn ji sedan pênciyê wê, ji alî sazgehên zimanê tirkî ve hatiye çêkirin. Di vî warî di pîvana herî rast nivîsên tirkî û kurdî yên kevn in. Tirkên Komara Tirkiyê nivîsekî bi tirkî ya beriya damezrandina Komara Tirkiyê nikarin fêm bikin; lê em Kurd bi hêsanî ji nivîsên Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî fêm dikin. Ku ji vana Elî Herîrî di sedsala 11'an de nivîsibû. Ziya Gökalp bixwe jî, van helbestvanên Kurd baş nas dike û di pirtûkên xwe de navê wan bîr tîne.

**Çavkanî:**

1) Ziya Gökalp, Kürt aşiretleri hakkında sosyolojik tetkitler, r: 122

2) Ziya Gökalp, bhd (Berhama ku navê wê derbas bû) r: 12


3) Ziya Gökalp, behd, r: 123

# Pirtûkeke çanda gelêrî

Folklor û adetên Kurdan gelek dewlemend in. Bingehên wan ên dîrokî, civakî û cografî hene. Bi hezar salan in, ku Kurd li ser axa xwe ne. Li welatekî wek Kurdistanê ku ji aliyê şaristanê ya kevin ve gelek dewlemend e. Wek tê zanîn, kultur bi jiyana civakî re dest pê dike. Her ku civak bi pêş ve diçe, kultur jî bi pêş ve diçe û rengîn û dewlemend dibe. Jiyana civakî, berhemên pêkhatî, ol û xebata polîtîk li ser kulturê tesîr dikin. Sî û rêçên xwe li ser dihêlin. Wek her civatî, di civata Kurd de jî, nîşan û dawet ji vê jiyana civakî û dîrokî beşek e. Ango ji deryaya kulturî dilopek an jî zerikek (tasek) av e.

Di van çend salên dawî de, di vî warî de, li Ewrûpa hinek xebatên hêja hatine kirin. Ji wan xebatan yek jî, Amed Tîgrîs bi cih aniye. Amed Tîgrîs bi salan li ser babeta nîşan û dawetên kurdî serê xwe êşandiye. Stran û lîstikên nîşan û dawetê berhev kiriye. Piştî xebateke dûr û dirêj bi navê **Nîşan û Dawet** pirtûkekê weşandiye. Amed Tîgrîs di pêşgotina Nîşan û Dawetê de wiha dinivîsîne:

"Di van 2030 salên dawî de, min bi çavên serê xwe gelek tiştên guhertî dîtin, ku çawa jêbermayiyên (adetên) Kurd ji navê radibin. Di bin van hoyên giran û zor de, çend sal paşê, dê gelek jêbermayiyên me yên din jî winda bibin. Ji ber vê yekê jî min biryar da, ku xwazgînî, şîranî (nîşan) û dawetên Kurdan ên ku min bi çavên serê xwe dît û bi xwe jiyam binivîsînim.




Di dema nivîsandinê de, min dixwest ku ji her perçe û herêmên Kurdistanê mînak bidim. Ji ber vê yekê, min ji herêmên **Diyarbekir, Bedlîs, Çebexçûr, Ruha, Mêrdîn, Batman, Semsûr, Cizîr, Sine, Sêrt, Çolemêrg, Hewlêr, Akrê, Qamişlo** û herêma **Badînan** nivîsand... Berî çapkirinê min tekst bi gelekî kesan dan xwendin û dîtinên wan girt..."

Nîşan û Dawet bi kurdiyeke gelek xweş û vekirî hatiye nivîsandin. Xwendevan tê de çêja (tama, lezeta) kurdî dibînin. Di dawiya pirtûkê de ji bo gotin û termînolojiya nîşan û dawetê, ferhengokê heye. Di pirtûkê de gelek wêne (fotograf) hene. Herdu berg (qabax) rengîn in. Ji dawet û şîraniyên bajarê Çolemêrgê hatine girtin. Nîşan û dawet 96 rûpel e. Pirtûk di sala 1991 an de li **Stockholmê** ji aliyê **Weşanxana APEC** ve hatiye çap kirin.

# AZADÎ



Abdurrahman Durre

## Mele

**Mela, kêra musulmanî ku tê, kêr nîne çaqo ye**
**Wekî das e li parsvanî, li şoreşvanî pirr ko ye**
**Li dora bênderê kund e, genim ku'j kozerê derxin**
**Ku seyda û melê gund e, niviştvan û mirîşo ye**
**Huneyn û Xendeq û Bedr e, mela cenga serefrazî**
**Berat û Leyletul qedr e, şeva azadî wek ro ye**

Mele du (2) celeb in. An warisê pêxember in, an jî virek û qeşmer in. Bi awayek din em bêjin: An leşxwir û mirîşo ne, an jî şoreşger û pêşverû ne. Hezretî Muhemed (As.), hem rêber bûye, hem jî şoreşger. Hem pêxember bûye, hem jî leşker. Hem rêzan bûye, hem jî şoreşvan. Di berbirê zilm û zaliman de, xwînmij û kedxwiran de, ceng û şer kiriye. Ala azadî û serfirazî hildaye. Ebd, kole, feqîr û mezlûman azad kiriye. Ji zilm, zor û belengaziyê xelas kiriye. Wekhevîtî û biratiya bi rastî eşkere kiriye û gotiye: "Însan hemû yek in, di hemû mafên însanî de wek hev in, tu kes ji tu kesî, tu gel jî, ji tu gelî, ne kêmtir û bê rûmettir, ne jî, zêdetir û bi qîmettir e. Herkes însan e, her însan jî, kur û keçên Adem û Hewa ne. Adem jî, ji axê çê bûye." Ev gotinên H. Muhemed, ên demokratîk û pêşverû, di hemû kitêbên hedîsan de hene. Bi taybetî, di xutba wî ya meşhûr, bi navê "Xutbetul wedayê" (Xutbe û gotinên xatir xwestinê) de, cih girtine. Demokrasiya H. Muhemed, demokrasiya bi rastî bûye, biratiya heqîqî bûye. Heqên hemû însan û gelan wek hev nas kiriye û di riya vî rastî û wekhevîtiyê de, ceng û şer kiriye û gotiye: "Kî ku ji bo heqê xwe bimre şehîd e, kî ku ji zaliman re serî deyne, alê neheq û zaliman bike, ne musulman e, bê îman e." Di gotinek xwe yê din de jî, wiha gotiye: "Alim (xwenda û zana) warisê pêxemberan e." Yanî li dû doz û şopa wan in. Her pêxember, gelê xwe ji koletî û bindestiyê derxistiye û azad kiriye, weke Musa pêxember, ku cihûyan, ji zilm, zor û bindestiya Fîrewnan rizgar û azad kiriye. Hezretî Muhemed jî, gelê xwe yê Qureyşî, ji zilma Ebûcehl û Ebûlehban xelas kiriye, ji hemû gelên mezlûm re bûye rêber, riya azadî, însanî û biratiya bi rastî nîşanî wan daye. Vê wezîfa pîroz û muqedes jî, di pey xwe re, ji aliman re mîras hiştiye. Ew kesê ku bêje ez musulman im, xwenda û zana me, şêx û mela me, alim û warisê pêxember im, divê ku li dû pêxember here. Gelê xwe yê mezlûm û bindest, ji pencê zaliman derxîne, azad bike, mal û canê xwe jî, di vê riyê de feda bike, ji bo heq û hiqûqên wan ên însanî û neteweyî û ji bo demokrasiyê bixebite, ceng û şer bike. Li hemberê, Fîrewn, Ebûcehl, zalim, xwînmij û neheqên zemanê xwe, serî hilde, berbirê wan derê, ceng û şoreşa azadiyê bike. Wek Şêx Seîd, wek Qazî Muhemed, Seyîd Ubeydullah, Seyîd Ebdulqadir, Seyîd Riza, Şêx Mehmûdê Berzencî, Şêx Ehmed, Mele Mustefa (Berzanî), Mele Selîm, Mele Seîdê Kurdî (Melê Meşhûr), Mele Ebdulah û bi hezaran wek wan şêx, seyîd û meleyên şoreşvan, şehîd û xazî. (Pirr serok, serdar, beg, mîr û axayên şoreşger jî hebûne, lê em, behsa mele, şêx û seyîdan dikin.)

***Demokrasiya H. Muhemed, demokrasiya bi rastî bûye, biratiya heqîqî bûye. Heqên hemû însan û gelan wek hev nas kiriye û di riya vê rastî û wekhevîtiyê de, ceng û şer kiriye***

Behsa Şêx Şabedîn û Seyîd Elî ku derbas bû, Kamuran İnan û gotina pêşiyan, ku dibêjin "Ji weliyan xwelî, ji xweliyan welî" hate pêş çavê min û min bê hemdê xwe wiha got: Hezar rehmet li ser axa Şêx Şabedîn, Seyîd Elî, Mele Selîm û şêx, seyîd û meleyên wekî wan be. Hezar nefret û heyret jî, li Kamuran û yên wekî wî be, ku dêla (qemça) xwe ji Ebucehl û Fîrewnên zemanê re dihejînin û li dû kûtê wan in.

Xwendevanên hêja! Çawa ku bi kurtayî me ji we re îzah kir, mele an şoreşger in, warisê pêxember in, an jî parsek û qeşmer in, gotin giran nebe caşik û ker in. Belê baweriya min ew e ku îro ji sedî notê wan (%90) şoreşger in, deh (10) jî, caşik û ker in, deng wilo tê guhê min. Gerçî, ên ku li Stenbolê ne, pirrên wan bûne hevalê guran, bi wan re leşan dixwin, lê xem nîn e, nan, av û keda welat, dê di dev û pozê wan ê qeşmer û genî re were. Dîroka şeref û azadiyê, dê naletê li wan bixwîne.

**Dîn ji dest naçe netirsin, dîn û îman ê we ne**
**Hûn li azadiyê bipirsin, hê ku îmkan ê we ne**

# Faşîzmeke eşkere: 12 Îlon

**Mîrhem Egît**

12'ê Îlonê nêzîk dibe. Ev roj rojeke tewandar (sûcdar) û gunehkar e. Destpêka meh û salên xwênawî û kezebşewatê ye.

Ev roj, roja general û faşîstên birakuj û bavkuştiyên me ne. Ji wê rojê û vir ve 12 sal derbas dibin. Ev 12 sal e, faşîzmê, li Kurdistanê û li Tirkiyê dest daniye ser her tiştî, li cihê kar jiyanê kontrol dike, destê xwe kiriye qirika gel û mîna lehiyê xwîna keç û kurên me dirêje. Ji bo me Kurdan ev roj, rojek ji rojên nexweştirîn û dildaxtirîn e, ku gel û neteweya me dinase.



*Serokê cunta 12'ê Îlonê Kenan Evren*

### 12 ÎLON NAVÊ WAHŞETÊ YE

Ev roj, generalên vê rojê, siyasî û hosteyên vê rojê heta li ser rûyê erdê bin û zilm û zordarî hebe, dê bi rik û lanetê, bêne bibîranîn.

Kesê vê rojê ji bîr bike, kesê bê hiş û bê hafize ye, sersar û bê mesûliyet e. Di nav me Kurdên li Swêdê de û nemaze di nav serokayetiya Federasyonê de kesên wilo hene. Li Stokholmê, li Eskilstûna û li Upsalayê hê jî carna berçav dibin. Ew bi çavekî din li dinyayê û li pirsa 12'ê Îlonê mêze dikin û bûyer û serpêhatiyên dîrokî bi mêzîneke ecêb diwezinînin. Ev mirov zarokên kêlîk û bîstika xwe ne, cihê xwe li ser nermaya penabertiyê xweş kirine, li ser îmkan û berjewendiyên mihacirtiyê, mexel ketine. Kurdistan giş bişewite baqek pûşê wan li ber nare.

Li gora wan û bi çavê wan 12'ê Îlonê kevin bûye, ji ber çavan bi dûr ketiye. Li Tirkiyê jî, rewş ne rewşa rojên 12'ê Îlonê ye, Tirkiye xwe diguherîne, demokrasî hatiye Tirkiye û Kurdên li Ewrûpa, karin herin û bên Tirkiyê. Ma çi ji vê rewşê baştir e û ev bi destên kê dikeve!!!

Ev felsefe ev çend sal in li Swêdê bejin dide û siyaseta bêmesûliyetbûyîn û mesexbûyînê di nav Federasyonê de pêl û leylan dide. Ji bo Federasyonê "sal bi sal xwezî bi par" dikare bête gotin. Ev çend sal in Kurdên nav Federasyonê ku tev bermayî û dawşiyên grûbên kevin in, roja 12'ê Îlonê nema protesto dikin û carna bi çelengekî meselê ji nav çavên xwe dikin.

Belê, ji bo hejmarek Kurdên derketî, penaber û di nav Federasyonê de êdî hewcedarî pê tune Kurd herin ber deriyê Balyozxaneya dewleta Tirk li Stokholmê û êdî nema mirov di kolan (cadde) û sikakên (kuçe) paytextê Swêdê de bicivin, biqîrin û dengê xwe bigihînin raya demokratîk û pêşverû.

Ev sefalet e, nizimbûn û mesexbûn e. Ev bêxemî û sersarî ye. Bêhafizebûyîn, xwe jibîrkirin û xwe şemirandina bi vî tewrî li tu welatên cîhanê di nav mirovên tu neteweyî de tune ne. Kêmaniyeke bi vî tewrî zarokên tu gelên cîhanê, nikarin qebûl bikin û bi pesinînin.

Şerm e, şermeke ji vê mezintir jî nikare hebe ji bo siyasî û rewşenbîrên welatekî.

Em qîma xwe nikarin bi şermeke wiha bînin û em nikarin xwe ewqas nizim bikin. Em cihê difikirin, cihê diwezinînin û ji awireke din radihêjin bûyer û serpêhatiyên dîrokî.

**Hîtler** û Hîtlertî fenomenekî Ewrûpî û kapîtalîstî bû. Ewrûpa û cîhan li bin guhê hev xist. Pirr welat hatin dagîrkirin û zêdeyî 40 mîlyon mirov hatin kuştin. Di nav neteweyên hatin qirkirin de, Yahûdî jî hebûn.

Di ser vê bûyerê re nêzîkî 50 salî derbas dibe. Heta niha li ser zilma Hîtler bi sedan flîm hatin çêkirin, bi sedan roman hatin nivîsandin û ewqas jî şano û tiyatro hatin pê. Yahûdî û dinyaya pêşverû vê serpêhatiyê ji bîr nakin. Kesên ev wehşet û hovîtiya Hîtler jiyane, dîtine û bûne şahid jê re zanebûnên xwe dinivîsînin, dikin belge û wesîqe, dikin flîm û roportaj. Ev ne bi tenê ji bo kes û mirovên Yahûdî belê herwiha ji bo giş mirovayetiyê û ji nifşên pêşerojê re jî, xizmet û berpirsiyartiyek e.

Pirraniya penaber û derketiyên Bakurê Kurdistanê ku niha li Swêde ne, mehkûmên rejîma 12'ê Îlonê ne û mûheqeq ji îşkenceyên 12'ê Îlonê para xwe girtine. Gelek ji wan di zîndanên 12'ê Îlonê de bi salan raketine, îşkence xwarine û bûne şahid û qurbanên zebanîtiya mirovên mîna **Esat Oktay.**

### EV ROJ DÎVÊ NEYÊ JÎ BÎR KIRIN

Heta niha jî, gelek ji wan şop û demxên zordariya rejîma 12'ê Îlonê hildigrin û di nav wan de hîn kesên tedawiya psîkolojîk dibînin hene. Ev kes çawa dikarin ewqas tade û xwînrijiyê di demeke wiha kurt de, di nav çend salan de ji bîra bikin û bêjin: "12'ê Îlonê kevin bûye û êdî hewcedarî bi xwepêşandan û mitîngan nemaye."

12 Îlonê kevin nabe, kevin nebûye. Heta milîtarîzm hebe, îşkence û lêdan li ser rûyê erdê berdewam be, mirov mirovan biperçiqînin, dê rejîm û felsefa 12 Îlonê jî, bête bi bîranîn û bibe hedef ji êrîşên heqxwaz, mirovhez û pêyketxwaz re.



*M. Salih Bilen (1960-1990)*



*Bayram Damlayıcı (1964-1990)*

## Hevalên qehreman

We bi qehremanî canê xwe da, li Amedê ro li ava
Dijmin dora we girtin, weke gurê dev bi xwîn
Lê, heta dawiyê, we li ber xwe da, baweriya we bi doza we û tivinga we hebû
We gula dawî berî serê xwe da, hûn teslîmî dijmin nebûn.
Em sond dixwin, ku doza we û tivinga we li erdê nahêlin, emê di rêça we de bimeşin. Şehîd Namirin

***Ji Farqînê komek hevalên wan ê têkoşînê***

## XAÇEPÎRS

**Amadekar: Rasto Zîlanî**

**Çeperast:** 1-Nivîskar û zanyarê Kurd, Piştnavê wî Mahmudov e. Piştî Şoreşa Oktobrê (Cotmehê), 2 sal di dibistana Partiya Komînîst de dixwîne, piştî wî jî, li zanîngeha Êrîwanê beşa dîrokê kuta dike. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Sovyetê bû. Hin ji berhemên wî ev in: Gelê Kurd, Dilê Kewê, Duajoyê Biçûk, Ocaxêd Vêşyayî Dîsa Dû kirin û hwd. Ev nivîskarê mezin di sala 1990 an de çû ser dilovaniya xwe. Di wênê de tê dîtin. 2-Arîkar/ Sebeb 3-Îrade/ Evîndarê Xecê 4-Ê ku navê wî derketibe/ Di leystika qaxezan de, yek 5-Li Rojhelata Ewrûpa navê neteweyek/ Çandinî 6-Dînî/ Navê ajansek nûçeyan li Rojhelata Almanya 7-Elektrodê negatîv 8-Navek pîrekan 9-Sewalek 10-Ne rast/ Payîtexta Brezîlya (kin)

**Serejêr:** 1-Muhteva/ Erd, xwelî 2-Navê giştî, yê kêlek, pêş, paş/ Belavbûna deng an jî bêhnê 3-Celebek bombeyê 4-Qertafek navçêkirinê/ Sembola Hesin/ Bi kêrî raxistinê tê, palas 5-Ayetek Quranê, li ser miriyan tê xwendin/ Hemû 6-Hicûm/ Qoq, qaf 7-Di çanda Kurdî yê kevn de navê Xwedê 8-Kinnivîsîna Amerîka/ Qertafa lêkera "bûn" ya pirrhejmar/ Ufq 9-Sebir, tebat 10-Bajarek li Japonya 11-Dema tê pêşiya peyvê, wê dike herî pirr, herî mezin 12-Hewar

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 | 11 | 12 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | | | | | | ■ | |
| 2 | | | | | | | ■ | | | | | |
| 3 | | | | ■ | | | | | | | | |
| 4 | | ■ | | | | | | ■ | | | ■ | |
| 5 | | | | | | ■ | | | | | | |
| 6 | | | | ■ | ■ | | | | | | | |
| 7 | | | | | | ■ | | ■ | | | | |
| 8 | ■ | | ■ | | | | | | | | | |
| 9 | | ■ | | | | | ■ | | | | | |
| 10 | | | | | ■ | | | | | | | |



**BERSÎVÊN XAÇEPÎRSA HEFTÎYA ÇÛYÎ**

Çeperast: 1-Hejar/ Babanî 2-Elîşêr/ Serad 3-Morî/ Adar/ Şe 4-Etîmolojî 5-Erk/ Ss/ Aşîtî 6-Ra/ Elem 7-Merasîm 8-Hakim/ Sa 9-Anîn/ Tas 10-Pîkolî

Serejêr: 1-Hember/ Hay 2-Elo/ Raman 3-Jîrek/ Ekîp 4-Aşît/ Erinî 5-Rê/ Îslam 6-Ramses/ To 7-Do/ Mîsal 8-Asala/ Masî 9-Beroş 10-Ar/ Jî 11-Naşît 12- Îde


## KARTA ABONETÎYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ...... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

**Nav:**

**Paşnav:**

**Navnîşan:**

**Bedelê abonetiyê razînin:**

**Li Tirkiyê û li derve:** Y. Serhat Bucak
İş Bankası Cağaloğlu Şub.
Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad.
Atay Apt. No:5 Kat:1 D:4 Cağaloğlu / İstanbul
Tel: 511 57 60 - 511 66 02 Fax: 511 51 57

**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 6 meh | 120.000 | 60 DM |
| 12 meh | 240.000 | 120 DM |

# Beriya 15'ê Tebaxê daxwaziya Gulîstanê

Gulîstan, bi emrê xwe 6 salî bû. Bavê Gulîstanê welatparêzek baş bû. Lê belê pirr xizan bû. Di wî halî de jî, beriya 15'ê Tebaxê gerîlayên PKK'ê hatibûn herêma wan, ji ber welatparêziya bavê wê, tim diçûn mala Gulîstanê. Ji wî qasî, Gulîstan bi emrê xwe yê biçûk bibû dost û hevalê gerîlayan. Ji diya xwe Zerê, bavê xwe Soro re digot: Ez mezin bibim ez ê jî, bibim gerîla.



Nêzîkî gundê wan, xayin, welatfiroş û nokerek mezin hebû. Xelkê herêmê jê re digotin Hacî Eliyê Firyarî. Navê gundê wî Firyar bû. Hacî Elî bi bênamûsiya xwe jî, nav dabû herêmê. Her demî keç û jina wî di hembêza qumandar û emniyeta Sêrtê de bûn.

Çûn û hatina gerîlayan çûbû guhê xayîn. Hacî Elî bi muxbîriyê, bi bextiyê mala gel û herêmê xira kiribû. Hingiv, pez, dirav, birinc, penêr, fêkî çi di destê gundiyan de hebûya; bi îşkencê, darê zorê, ji destê wan derdixist. Tiştê ji wan distende wî emniyet û generalê leşkeriya Sêrtê li hev parî dikirin.

Di gund û bajaran de hema hema di her malî de, yê nêdabû girtin tune bûn. Zilm û zora wî çûbû ber êrîşê êzîm. Ew çar car bavê Gulîstanê jî, dabû girtin. Di girtina paşiyê ya îşkencexana Sêrtê de, bavê Gulîstanê seqet bûbû.

Gulîstan û zarokên gund tevan, navê Hacî Elîyê bênamus bihîstibûn.

Gerîlayên herêmê jî, ji ber wî qasî hatibûn serxweşiya bavê Gulîstanê. Gerîla gava hatin, Gulîstan bi girî xwe avêt pêsîra wan. Gulîstan nav gerîlayan de zehf hez ji heval Mahmut dikir. Heval Mahmut gava halê wan pirsiya, beriya diya xwe Gulîstanê bersiv da. Got:

-Hevalê Mahmut, Hacî Elî bavê min da girtin. Bavê min di îşkencexanê de seqet ma. Ewda (heyfa) bavê min hilînin. Serê Hacî Elî jê kin.

Gerîla; Gulîstanê himêz dike. Hêstirê çavê wê paqij dike û dibêje:

-Megrî, kulîlka me, heyina me. Em ji bo çi dijîn. Em ji bo guhertina jiyana te û mîlyonan zarokên welêt dijîn. Tu qet meraq meke. Bi soz emê daxwaziya te bînin cih.

Gerîla beriya hefteya 15'ê Tebaxê ketin nava bajarê Sêrtê. Pêşberê Tugaya Sêrtê, rex dibistana Lîsê, bi keleşkofê mejiyê Hacî Elî belav dikirin ser rê.

Gerîlayan bi wê lebatê, tovê serxwebûn û berxwedanê car din, daxwaziya Gulîstanê reşandin dilê Kurdistanê.

***Cezair Açıkça***
***Girtîgeha Ceyhanê***
***EDENE***

# Pûrtên bedew

Rojek ji rojan tawisek gelek bi xasûkî (qurnazî) û zexelî di neynikek de li pûrtên xwe yên rind û bedew nêrî û bi pozbilindî qirîşkand:

-Ez bedewtirîn giyanleberên ser zevî me, pêwist e balindan her xorakek ku dilê min bixwaze bo min amade bikin...

Tawis çaverê bû ku balindên din fermana wî zû cê bi cê bikin... Lê tu balindek guhê xwe neda fermana wî... Tawis jî gelek xeyidî û ji ordek re got:

-Ez şahê balindan m... Xoraka xwe bide min...

Ordek jî got:

-Çima tu bi xwe xorakekê xwe amade nakî?

-Paşê tawis li mûstrangek mêze kir ku dixwest dendike genimek hilgire... Çû cem wî û got:

-Eger vî dendike genimî bidî min, ezê pûrtekî bedew bidim te!

Mûstrang jî got:

-Li cem mûstrang genim xweştire ji pûrtên bedew û ciwan, lê rûvî hez ji perrên rengîn dike...!

Tawis çû û gehîşt ber mala rûvî... Birçîtî taqeta wî biribû... Îca ji rûvî re got:

-Tu hinek genim bidî min ezê hemû pûrtên xwe bidim te... Rûvî, ji vî tiştî razî bû û hinek genim da tawis. Tawis jî hemû pûrtên xwe derkişand (rûçikand) û da rûvî...


Wexta tawis hemû pûrtên xwe derkişand dîmena wî pirr ne şêrîn bû... Li serman de çike çik bi nikila wî ketibû û dileriziya... Rûvî bo wî got:

-Serma te dikuje. Hûrê "zikê" min gelek mezin e û ez bextewer dibim ku hûn tê de bijîn...

Tawis ku gotinên rûvî dibihîse bi temamî şeperze dibe û ditirse, herwiha pê dihese ku di nav tengiyekî de ye... Îcar ji tirsan bi lez direve û diçe...

Ênanê ser şêwa Kirmancî: Mehabad Kurdî

***Çavkanî:*** Pertûka "Minal û Baran", Letîf Helmet kiriye kurdî



# Yarî

Laço laço dey biro
Yarî nakem legel to

To elêy şêt û harî
Nazanî çone yarî

Dar ekêşî be serma
Cil edrênî le berma

Be buz eçîte ser kol
Firê edey berd û xol

Ya pal enêy le nakaw
Mar ekey dem û çaw

Weku min nît bizêwî
Fêrî şere cinêwî

Heta wabî dey biro
Yarî nakem legel to


Yarî dinyay beheşte
Yarîkeran firîşte

***Elî Edul Şewnim***

# Şehîdên Îlonê nemir in

*Kemal Pir, M. Hayri Durmuş, Akif Yılmaz û Ali Çiçek di vê mehê de ketin nav karwanê nemiran*

**Di ser şehîdbûna lehengên me re îro zêdeyî 10 sal derbas dibe. Xebata siyasî û berxwedana gelê me jî ketiye warekî din û bûye lehî. Şik tê de nîn e ku mezinbûna şoreşa Bakura Kurdistanê pirr tişt deyndarê şehîdên meha Îlonê û herçar şehîdên me yên mezin e.**



Kemal Pir — M. Hayri Durmuş — Akif Yılmaz

Di dîroka berxwedan û şehîdên me de, meha Îlonê xwedî cih û şopên kûr e. Di vê mehê bi tenê de, zêdeyî 30 şehîdên Partiya Karkerên Kurdistanê hene. Di nav van şehîdan de, çar serok û çar bexwedanvanên zîndana bajarê Amedê yên navdar hene. Navên van lehengên me **Kemal Pir, M. Hayri Durmuş, Akif Yılmaz** û **Ali Çiçek** in. Ev herçar şehîd şûneke taybetî digirin û ev şêremêr xwedî wezneke giran in.

Kemal Pir roja 7.9.1982 an, M.H.Durmuş roja 12.9.1982 an, Akif Yılmaz roja 15.9.1982 an û Ali Çiçek jî roja 17.9.1982 an de yek li pey yê din piştî greveke birçîbûnê şehîd ketin û ketin nav karwanê nemiran li Kurdistanê.

Di ser şehîdbûna lehengên me re îro zêdeyî 10 sal derbas dibe. Xebata siyasî û berxwedana gelê me jî ketiye warekî din û bûye lehî.

Şik tê de nîn e ku mezinbûna şoreşa Bakura Kurdistanê pirr tişt deyndarê şehîdên meha Îlonê û herçar şehîdên me yên mezin e.


Ala şehîdên Îlonê îro bûye ala mîlyonan û slogan û dirûşmên wan bûne çekên serhildanan, li bajar û gundên welatê me, li derve û li hundir û di dengê sedhezaran de abadîn (ebedî) bûne.

Belê, Kemal, Hayri, Akif û Ali nemir in, di sloganan de dijîn, di berxwedan de, di xebatê de dijîn. Ew ji bo me bûne bawerî, hêz û enerjî, bûne rêber û rêpêşander.

Ew bûne xwîn û can û rohniya çavan, ji bo me. Bi saya wan xwîna laşên me baştir digere, çavên me baştir dibînin, guhên me baştir his dikin û em ji hergav şarezatir û hişyartir in.

Cenga me çeperên bêdengî û kerra yê şikênandiye, heta bi nav gelê Tirk çûye û cîhan giş bi me hisiyaye. Em bi xêra şehîdên Îlonê bûne xwedî yekîtiyeke mezintir û bi organizetir. Em bi gavên saxlem li serxwebûn û azadiyê nêzîk dibin û kozikên koletî û bindestiyê dişkînin.

Bêyî ewqas şehîd, ewqas mêrxasî û mêranî û bêyî şehîdbûna Kemal Pir, Hayri Durmuş, Akif Yılmaz û Ali Çiçek qonaxa em îro têde ne dê ne mumkun bûya. Em bi hinceta şehîdên meha Îlonê rêzdarî û hurmetên xwe pêşkêşî giş şehîdên Kurdistanê û şehîdên meha Îlonê dikin û diqîrin: Şehîdên me, şehîdên meha Îlonê, nemir in.



*Kemal Pir, Mazlum Doğan û M. Hayri Durmuş di zîndana Diyarbekirê de.*

welat

• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır
• Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Cağaloğlu / İstanbul •Tel:511 57 60 - 511 66 02
• Fax: 511 51 57 • Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
• Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rua G-401 92763 Antony Cedex France
• Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ